أصابعي لم أعد أشعر بها، لا صوت يلوح بين الجدران سوى أنينِ أفواهنا وقرقرة بطوننا الخاوية، أما في اليوم السابق كان لنا صوتٌ مليء بالنشيج بالإضافة لصوت ارتطام الدمع بالأرض وكان الشيء الوحيد الذي نملكه لنكسر هيبة السكون والصمت، فلا شيء يُقاطع هذه الأصوات إلا صرير الباب الذي يجعل من نبضات قلبنا تتسارع حدَّ التوقف.

في اليوم السابق الذي لا زلت أتذكره جيداً تبادلنا الحديث نحن والشخص الذي يتلذّذ بعذابنا. نحن نرد عليه بصرخاتنا، وهو يحاورنا بالضحكات مع كل أنواع الشتائم. وكلما سألهُ أحدنا» ما الذنب الذي اقترفناه؟!! يجيبنا بتمرير التيار الكهربائي إلى أجسادنا فنرقصُ كالطيور المذبوحة. يقول لنا مجيباً: «لم تفعلوا شيئاً يا أولاد العاهرة». هذا الجواب الوحيد الذي سمعناه طول أربعة دقائق كانت كفيلة بأن تشبه الأعوام

أما اليوم كان على غير العادة، فقد اكتشفت بأن الانتظار سيأكلنا من الداخل وأن الوسيلة التي ستُخلصنا مما نحن فيه هو الكهرباء التي كنا نخشاها البارحة، أردتُ أن أصرخ فلم أستطع، يبدو أن الخدر قد وصل إلى حنجرتي قبل قدميَّ.

كل ما أود معرفته السبب الذي أوصلنا إلى ما نحن فيه؟

جمعتُ كل طاقتي، وقلت لصديقي الذي أغشاهُ الألم حدّ الإغماء: ما الذي فعلته حتى نحن بهذا الحال؟!!

جرّ بقايا صوته قائلاً: لقد تجرأتُ على الأحلام وعندما أمسكوا بنا كان في حوزتي القليل من الأمل، كنت أحتفظ به كي لا أُصبح منزوع الإنسانية وتاه في صمته مثلما تُهتُ في بُنيّات أفكاري.

أذكرُ أنني سمعتُ أزيز الباب مرّة أخرى، وبأول سوطين فارقت الوعي، ولم أستفق إلا وأنا على قارعة طريقٍ على أطراف مدينتي.

كيف وصلت؟!! ومن أوصلني إلى أقرب مشفى لا أدري!!

ما الذي حلَّ بصديقي، لا أدري!

بعد مرور عدّة أيامٍ...

جلستُ أمام مرآتي وكنت لنفسي القاضي والمتهم..

القاضي الذي في مرآتي سألني: ما هو جرمك؟

قلت باستغراب: يبدو أننا تجرأنا على الحلم وتعاطينا القليل من الأمل وسط كل الخراب الذي حولنا..

ردَّ: ومن أنتم؟!

قلت: نحن أبناء العتمة يا سيدي.

نحن الذين أكلنا الكثير من السياط، ونمنا ببطون خاوية..

قال لي: فلتتمسك بما بقي من إنسانيتك وحافظ على الحلم والأمل، واحذر من اليأس مرة ومن الجاهلين مرتين، فلابدّ للأمل أن ينتصر. رفعت الجلسة.

غَفوَة



رشيد سبابو*

في مَكانٍ ليس بالهَادئِ أبداً
برأسٍ مُثقلٍ بالأَسبِرينْ
وأوراقٍ مُبعثرةٍ على الذّاكرَة
أمكُثُ في صَمتٍ
أواسِي ما تبقّى مني
وأُلوّحُ لمَا مضَى بلاَ تأسُّفٍ

تحتَ سماءٍ
قرَّرَتْ أن ترفُضَ كلَّ الصّاعدينَ إليهَا
أمشِي تاركًا كُلّ شيءٍ خَلفِي
بلاَ تردُّدٍ
فقد انتَظرتُ على الرّصيفِ دَهراً
حينَ لم ينتظِرنِي أحَدْ

وسطَ سَاحةٍ عُموميّةٍ
يمُرُّ النّاسُ عليَّ شِيَعاً
يُعزُّونَني فيمَا فقدتُ
وفيمَا سأفقِدُ قريباً
قَائلِين: طُوبَى للبَائسِين

* شاعر من مواليد سنة ٢٠٠٣ بالمغرب، طالب سنة أولى شعبة علم الاجتماع، مؤلفاته: مرثيّة العشق والألم (دار أركان للنسر الإلكتروني ٢٠٢٠)، غرابٌ يُواري سوءةَ اللّيل (دار اقتباس للنشر الحديث ٢٠٢١).

فِي الأزقَّةِ الضيّقَة
أمُرُّ بلا مُبالاَةٍ
حينَ تُشيّعُني الشُّرفَاتُ من أعلَى
والعجَائزُ المُطلاّتُ من النّوافذِ الصّغيرَةِ
والأطفَالُ الذينَ يلعبُون الغُمّيضَة
كلُّ شِبرٍ في الأرضِ يُشيّعنِي بحَسرةٍ
لأنّني لا أملِكُ تابُوتاً

في رُكنٍ صَغيرٍ من العَالم
حيثُ يسكنُ اللاّمعنى
ويتمدّدُ ظلُّ الأرقِ على المضَاجعِ برَشاقةٍ
أريدُ أن أغفُو بسلامٍ
مُتجرّداً من الشّاعرِ الذي يسكُنني
إلى حينٍ غيرِ معلُوم

غفوة حلم

أفين أوسو*

في الحلم تراءى لي طيفه
وريش جناحيه المبتلّ
برفيف دمه يتراقص.
يزفّ ما طاله للعدم
بنصل شفاعته يبتر أضاميم الشّموع
والخيوط ترثي فقيدها
لا نفع يتجلى من التوحّد غير الذّوبان
كفّ عن الالتحام.
ليبدأ بفصل ذاته عن ذاتها
ويحمل فأساً في صروح الوجد
والورق يهزي
يقشّر لحاء يساري برسالة وداع أبديّة
وصليل خيوط وشاحه
ذاك الّذي نسجته بنول أحلامي الطّوباويّة
منها تنساب الألوان متسائلة:
أين ارتجاف يديها على طاولتك خجلاً
وشغب ضحكاتها المرتبكة
المستفزّة

* شاعرة وروائية، من مواليد مدينة عفرين عام ١٩٩١م، تقيم حالياً في ألمانيا. صدرت لها رواية «أرواح تحت الصفر» عن دار «ببلومانيا» في مصر عام ٢٠٢٠م.

تلك الأصابع الّتي نسّقت فوضانا لتقيك جحيم بردك
كيف تتناسى ميقات نبضها
وملامحك تنساب غدقاً من بين أضلعها
لا تتّقى شمسها
ففي معطفها
أسماك قصائدك
تسبح في زبد دمعها.
اقترب و تمرّغ بين الثّنايا
واستنشق
استنشق نبض أضلعك
وتتمّتك
من أثر عطرها بين الطّيّات.
أحصى ضحايا ديدان القزّ
في سبيلك.
وأكتب لها
لنذوب في الحبّ مراراً
لنكون ضيوف الخطيئة
وننسى بدع التّوبة والفضيلة.

انتظرها

محمد بلال*

بشمسٍ تُنيرُ ربيعَ الكلماتِ
بسماءٍ مخملية الغيمِ
بانبلاجِ فرحة المطرِ في الأرض
بصمت الليل في ستر الأسرار
انتظرها...
بدفء دموع عين الأمهاتِ
بحنان الناي ورشفة النبيذ
بحسرة المنفي وأمل السجينِ
برائحة الشوق المعطر باللقاءِ
انتظرها
بأول شهيقٍ في البكاءِ
بحس الكنار لأول تحليقةٍ
بالوقت المسروقِ من الخلودِ
بشهوة العاشقين في الاندماج
انتظرها
بقوةِ التعويذةِ التي كتبت على الماءِ
بحرارةِ النارِ في حرق الرمادِ
بشهادةِ التراب في خلق الذات
بلمسِ الريح لتجاويفِ الشفاه
انتظرها
وانتظرها حتى يشتهي الانتظارُ نفسهُ وينتظرها...



* مواليد الطبقة على ضفاف الفرات عام ١٩٩٢م، انتقل منذ صغره مع عائلته إلى منطقة راجو في إقليم عفرين، درس المعهد الصناعي في عفرين، وتعلم لغته الأم «الكردية» في راجو. اضطر للنزوح إلى تل رفعت بعد الاحتلال التركي لعفرين، ويعمل هناك كمعلم ومدير لمدرسة ابتدائية..

صَبَّتْ كأساً وانْتَظرت أنْ يبرد!

كمال الإدريسي*

(كَأَنِّي أَسْمَعُ قَرْعَ طبُول مَصْدَرُهَا المخزن)

– هلْ أبدو لكِ منَ الهُنودِ الحُمر؟
ثمّ ضَحك.. !

كُلّ شيء يَضْحك:
السّيجَارة عَلَى شَفتيه المشرُوختين، الدّمع، والسّهر، ورائحةُ الجدرانِ،
السّتائر، وكراتُ الصّوف، وحباتُ الغبار على أفواهِ القَنَاني..
وكُلّ الخُرافَةِ.

بينما تَسَمّرت (مَاري الصّغيرة)
مَشْدُوهَة بِحَمّالة النّبالِ عَلى ظهرِهِ
وبَعْض الخدوشِ
غائِرة وحَمراء
كمَا رأتْ نُتَف الرّيش في يدِهِ
تَرْتَجِف.

*كاتب وشاعر مغربي، مواليد الدار البيضاء عام ١٩٨٦م، يعمل أستاذ السلك الأول، لغة عربية، ومسرح وتواصل. صدر له تسعة كتب موزعة بين الشعر والزجل والقصة والمسرح.

قالتْ:
– أنْهِي الأمْرَ بأقصَى مَا يُمكنكَ
الوحشُ داخلكَ يُعاديني.. !
قال:
– لنلعبْ لعبَة. بأيّ اليدينِ وَرْدة؟

قرأتْ في عَيْنيه رسائلَ مشفرة
الشّوكُ بكلتَا اليدينِ
هُو استمرارٌ للخدوشِ
بظهره.

حَانتْ منها ابتسامةٌ باهِتَة
وأغلقتْ بابَ المخزنِ
فقد مَلأ مَسْمعها صَوْتُ أمّي دَادَا:
– مَاري أسْرِعي شَايُكِ يَبْرد!

مَن يكتب مَن.. الشاعر أم القصيدة؟

إبراهيم محمود*

الشاعرية هي الموهبة وهي التي تتحكم بتجربة الشاعر أثناء مخاض القصيدة، فهي التي تحفظ اسم الشاعر وهي التي تنسكب في مداده..

الشعر ديوان العرب، وإذا كان الشعر يعبر عن حضارة أمة ما ويتحدث بلسان ضمير المجتمع فإن الشعر العربي هو الديوان الذي يؤرخ الأحداث ويثبت القيم ويمجد البطولات، وقد اشتهر العرب ولا سيما في العصر الجاهلي بقوة اللغة وقوة الشعر، وقد برز قول لكثير من الشعراء بأن الشعر هو من يكتب الشاعر

* شاعر من مدينة منبج، مواليد ١٩٧٩م، حاصل على إجازة في الحقوق ويعمل في المحاماة، له ديوانا شعر مخطوطان، ويشارك في النشاطات الثقافية والأدبية بمدينة منبج.

أو القصيدة هي التي تكتب نفسها على لسان الشاعر وهذا يثير كثيراً من التساؤلات، جميعنا يعلم ما للبيئة وللظروف من أثر على الشعر وعلى الشاعر وعلى ألفاظه وصوره، فشاعر يعيش ظروفاً صعبة وحياة قاحلة ربما يكون شعره وعراً وصلباً وألفاظه خشنة وصوره صعبة وتراكيبه جزلة، أما شاعر يعيش عيشاً رغيداً ويتأمل الأزهار فتنسكب ألوانها في صوره ويسمع تغريد الطيور فيغرد معها لا بد أن تأتي ألفاظه سهلة سلسة وصوره ناعمة وتراكيبه رقيقة وشعره سهل رشيق.

ولكن ذلك لا يعني أن العنصر البشري دوره معدوم بل على العكس ان الدور الأكبر هو للشاعر ولتجربته وخبرته وتكوينه الأدبي ومهاراته المعرفية، ولا شك أن القول بأن القصيدة هي التي تكتب الشاعر قول لا يخلو من المبالغة و للتعبير عن الحالة الغيبية أو ما يسمى الإلهام الشعري. فمهما كانت شحنة الإلهام الشعري متقدةً في قلب الشاعر فلولا سعة اطلاعه وإلمامه بالعروض ولو بشكل سماعي واستفادته من تجارب الشعراء الآخرين المعاصرين له والسابقين فلن يوفق في إنتاج قصيدته، لذلك فإنه و برأيي فأن الشاعر هو من يكتب القصيدة ولكن الشاعرية التي تقدح الحياة والحركة في النص وتميز الشعر عن النظم هي الجانب الإلهامي الغيبي والتي قد يصعب إمساك زمامها ووضعها تحت المجهر، لأنه وبالمقابل من يتقن العروض كعلم ويكون من أصحاب الخبرة فيه ومن أهل الاختصاص قد يصعب عليه أن يكتب بيتاً واحداً من الشعر.

فالشاعرية من الشعر بمثابة الروح وقد لا يوفق للوقوف على ذلك إلا من يجيد التمييز بين النظم والشعر، فإذا كنا أمام نصين في الرثاء، أحدهما جعل الدموع تترقرق في عيوننا لكونه مشبع بالألم والحنين، أما النص الآخر فيفيض بتمجيد المتوفى وذكر مناقبه ومآثره، لا شك أن النص الأول الذي يفيض بالألم والبكاء هو أقرب إلى النفس لمحاكاته الوجدان واستدراره الدموع فهو نص يهز القلب والروح، أما النص الآخر فنحن أمام احتمالين إما ان يكون النص زاخراً بالصور ومجنحاً بالخيال وبعيد عن المباشرة والتقرير والسرد فهذا أيضاً يحرك النفس والخيال ويكون مفعماً بالشاعرية، اما الاحتمال الثاني فهو أن يكون هذا النص مباشراً سردياً تقريرياً لا عمل فيه للخيال ولا للوجدان ويعاني من العطالة الشاعرية، فهذا يكون نص خالي من الشاعرية ويعبر عنه بالنظم، هذا النوع من النظم وإن كان يبدو شعراً من حيث الشكل إلا أنه بعيد عن الإلهام وعن الشاعرية، فيأتي جافاً خالياً من الحياة والروح والحركة، وهذا النص يكتبه الناظم ويتحكم فيه ولا دور لشحنة الإلهام الشعري فيه.

وخلاصة القول إن من يقول بأن القصيدة تكتب الشاعر ربما كان قصده من ذلك أن الشاعرية هي الموهبة وهي التي تتحكم بتجربة الشاعر أثناء مخاض القصيدة، فهي التي تحفظ اسم الشاعر وهي التي تنسكب في مداده. وبرأيي الخاص إن الشاعرية لا تكتسب اكتساباً وإنما هي بذرة موجودة في نفس الشاعر قابلة للشحن والشحذ الذي يزيدها اتقاداً ونضجاً، أما إن لم تكن هذه البذرة موجودة في نفس الشاعر فلا يمكن صناعتها وسيبقى نتاجه الشعري أقرب للنظم وبعيداً عن التأثير في نفس القارئ والمتابع.

ورحم الله من قال:

إذا الشعر لم يهززك عند سماعه
فليس حرياً أن يقال له شعر.

■ **Gundê Şûniyê**

Ş. Semîr, Ş. Akif, Ş. Qehreman, Ş. Rustem, Ş. Jînda, Ş. Cemîle, Ş. Herekol, Ş. Dara, Ş. Hogir, Ş. Rustem, Ş. Çekdar, Ş. Med, Ş. Bahoz.

Li rojhilatê gund Mezelê gund û gund Sefawîyê heye, li Başûrê gund rêya di navbera bajarê Helebê û Qamişloyê de, li Rojava gundê Heno, li Bakur jî gundê Tel Xezal e.

Şêniyên gund debara xwe bi çandiniyê wek Genim, Kemon û Ceh dikin Her wiha jî xwedîkirina Sewalan.

■ **Gundê Şûniyê**

Gundê Şûniyê

Serbest

Gundê Şûniyê girêdayî bajarê Til Temirê ye, 16 km dûrî bajêr e, 35 km li Başûrê Dirbêsiyê û 45 km li Bakurê Hesekê dikeve.

Gund bi eşîreya Kîkanê tê naskirin û ji 65 malan pêk tê.

Berê gund ji aliyê axeyê gund ve dihat birêvebirin, piştre eşîra Kîkanê hat.

Yek ji taybetmendiyên vî gundî ku 65 bîrên avê lê hene.

Dibistan li gund di sala 1950î de ava bûye û bi navê Ş. Ristem tê naskirin, her wiha gund xwedî mizgefteke kevn e.

Niha gund ji aliyê komîna Ş. Semîr ve tê birêvebirin. Ev gund weke hemû gundên dîtir pareke xwe ji şoreşa Rojavayê Kurdistanê heye ku keç û ciwanên xwe tevlî nava refên YPG û YPJ›ê bûne û hejmarek jî cihê xwe di rêveberiyê de digirin.

Di gund de saziya malbatên şehîdan heye û 13 şehîdên xwe jî hene, navê şehîdan:

■ Gundê Asî

ku ava xwe jê dibirin, bîrên wan jî çêbûne û ti kes ji van gundan ji bo avê nayê vî gundî.

Li gundê Asî aşek heye û xwediyê wî bi navê bavê Xorşîd tê naskirin.

Di sala 1989›an de dibistanek ji gundê Asî û gundên derdora wê wek gundê Hîznî, Boxaz, Sedkirêma, Lîzga û Hicêra re hate avakirin.

Li vê dibistanê xwendin ji refa yekê ta refa dehan heye û gelek mamosteyên gund jî çêbûne.

Xelkên gund debara jiyana xwe bi çandiniya ceh, genim, kemûn û nîskan dikin.

Li gundê Asî gelek baxçe hene û her malbatek xwedî pez e.

Gund niha ji aliyê komîna Ş. Mezlûm ve tê birêvebirin.

■ Gundê Asî

Gundê Asî

Gundê Asî girêdayî bajarê Til Temirê ye. Gund bi 15 km Bakurê Til Temirê ye, 60 km li başûrê bajarê Dirbasiyê dikeve, 60 km li rojhilatê bajarê Serê Kaniyê dikeve û bi 60 km dikeve rojavayê bakurê Hesekê.

Ev gund berê yê Reşîd Axa bû. Piraniya şêniyên gund ji eşîra Hacara ne û li kêleka wan eşîra Barava, eşîra Dîlverî, Hevêrka û malbateke ereb ji eşîra Behî hene.

Li gund 45 mal hene û hemû weke malbatekê bi hev re dijîn.

Li derdora gund hemû kevirên reş in ku pê bingeha xaniyên xwe ava kirine.

Rûspiyê gund ê ku gund bi rêve dibir Hecî Mehmûd Sidê Teyo, Hecî Dumîd û Qadê Imero û Osman bûn.

Her wiha di gund de rola jinê jî dihat meşandin ku ew jinên ku roleke çalak dilîstin pîra Emîna Oso û Emîna Helîmo bûn.

Emîna Oso di gund de weke bijîşkekê bû.

Di gund de bîreke avê hebû û bi keviran dorpêçkirî bû. Xelkê gund ava xwe ji vê bîrê dibirin.

5 gund li derdora vî gundî hebûn ku dihatin ava xwe ji vê bîrê dibirin.

Niha ew gundên li derdora gundê Asî

■ Gundê Boxaz

Şêniyên gund debara jiyana xwe bi çandiniyên wek genim, ceh û nîskan dikin, her wiha bi karê sewaldariyê re jî mijûl dibin.

Di sala 1970›î de dest bi amadekirina bendavekê kirin û di 1973'an de avakirina bandavê bi dawî bû. Av ji gelî û newalan diherike ser vê bendavê

Li derdora bendavê 4 gund hene; gundê Boxaz, Lizga, Enabiya û gundê Kirîmahî.

Di sala 1989›an de dibistanek ji xwendekarên gund re hate avakirin. Her wiha gundên derdorê jî zarokên xwe dişînin vê dibistanê.

Di kevn de cebarciyek bi navê Hec Kermo hebû, şkestina hestiyan dicebirand.

■ Gundê Boxaz

Gundê Boxaz

Gundê Boxaz girêdayî Til Temira kantona Hesekê ye. 17 km li rojhilatê Til Temirê dikeve. 60 km li rojhilatê Serê Kaniyê dikeve. 60 km li rojavayê bajarê Hesekê dikeve.

Gund ji 4 eşîreyan e ew jî wiha ne: Sorka, Necara, erebên Bû Hemdan û eşîreya Dîlverya.

Gund ê Axa Kermo bû û Mîkaîl bû piştre. Hecî Kermo, hec Xelîl û hec Hesen ku her sê birayên hev in û bi wan re Qado Ehmed ji Dirbêsiyê hatin û malên xwe li wir ava kirin.

Destpêkê bîreke avê ji xwe re kolan û ava vexwarin û çandiniyê jê peyda dikirin.

Ta niha hejmara xaniyên gund gihaştiye 40 xanî, Gund jî bi çandiniyê tê nas kirin.

Ew jî weke hemû gundên kurdan ji Çembera Erebî nefilitî û rêjîma Sûriyê bi rêya wê siyasetê erdên şêniyên gund di sala 1967'an de standin. Careke din gundiyan erdê xwe bi pereyan vegerandin. Ev jî xuya dike ku du caran gund kirîne.

Sê Gundên Til Temirê (Boxaz- Asî – Şûniyê)

Şerîf Mihemed

Gundê Boxazê bi 17km li rojhilatê Til Temirê dikeve, û gundê Asî bi 15km Bakurê wê ye, û gundê Şûniyê bi 16km dûrî bajêr e.

*Şerîf Mihemed: di sala 1979an de li bajarokê Şiyê yê girêdayî Efrînê hatiye dunyayê, sala 1990î bi malbata xwe re koçî bajarê Helebê kirine, sala 1995an derbasî nava kar û xebata hunerî bûye. ji 2011an ve bernameya Ax û Welat pêşkêş dike.

“Eger hûn rojekê bibin dildar, mîna berfînê wêrek bin”

■ **kulîlka Berfînê**

Berfîn (kulîlka berfê) ji malbata nêrgizan e, ku 20 cureyên wan hene. Berfîn weke pîvazan tên çandin.. Şeklê wê weke zengilan û bi qasî 5-15 sm bilind dibe. Bi giranî zivistanê şîn dibe lê carna biharê jî derdikeve. Li seranserê cîhanê 100 cureyên wê hene. Ji bo domandina jiyanê her zindî bi rengekî li ber xwe dide. Der barê berfînê de, di mîtolojiyê de wiha tê gotin: “Berfîn guleke pir bedew, nazik û şîrîn e. Bi awayekî xwezayî mirov dibe dildarê wê. Tevî wê nazikiyê di sir û seqemê de şîn dibe. Bi wê bedena nazdar di nava berfê de li ber xwe dide û dijî. Berfîn jî mîna zindiyên din dibe dildar. Dildariya wê ya li hemberî tavê roj bi roj pirtir dibe. Ji bo wê gazî Xweda dike û dibêje; ez ji tavê pir hez dikim, ji bo wê dixwazim bibînim. Xweda jê re dibêje; tu nikarî bibînî. Çimkî dema tu bibînî tu yê bimirî. Ji bo dîtina tavê berfîn ji ya xwe nayê xwarê. Xweda jê re dibêje, yan jiyana te yan jî evîna te. Biçe pştî du rojan li min vegere û biryara xwe bide. Berfînê berê biryar daye. Çimkî dildariya wê ya tavê êdî dişewitîne. Piştî du rojan berfîn vedigere cem Xweda û jê re dibêje, dixwazim tavê bibînim. Xweda dibêje; ez wêrekiya te pîroz dikim. De biçe bi çiyê ve hilkişe da tu evîndara xwe bibînî. Lê mixabin dema tu bibînî ew roja te ya dawiyê ye. Berfîn berê xwe dide çiya û evîna dilê xwe dibîne. Lê mixabin bi dîtina tavê re dimire.

Ji bo wê di mîtolojiyan de dibêjin, eger hûn rojekê bibin dildar, mîna berfînê wêrek bin.

■ kulîlka Beybûnê

heskiriyekî wê hebû navê wî Roman bû. Pir ji hev hes dikirin, ji germaya dilê xwe û dildariya xwe herduyan hîsdikrin ku ew ne mirovên ji rêzê ne. Dildariyeke wiha dinava mirovan de peyda nabe, lewra wan ew hîs, hîs dikrin.

Evîndaran her roj bi hev re derbas dikirin. Roman hes dikir ku diyariyên bedew bide hevala xwe, mîna keçikê, ku ew daye wî. Carekê wî kulîlkek ji delalê xwe re anî - wî ev yek berê li cihekî nedîtibû. Keçikê demeke dirêj ji vê kulîlkê hes dikir. Ew nerm bû - pelikên spî yên dirêj li dora navenda tavê radiwestiyan, lê ji kulîlkê evîn û dilovaniyeke wisa derket ku keçikê bi rastî jê hez kir. Wê spasiya Roman kir û jê pirsî ku ew mûcîzeyeke wiha ji ku derê aniye? Wî got ku ew di xewna vê kulîlkê de ye û dema ku ew ji xew rabû wî ev kulîlk li ser balîfa xwe dît.

Keçikê pêşniyar kir ku navê vê kulîlkê Beybûn be, li gorî navê Romanî yê dilovan û Roman jî ew nav pejirand. Keçikê got: “Çima min û te tenê guleke weha heye? Roman fêm kir ku ne gengaz e ku mirov ji xewnê kulîlkekê bistîne, lê wî nekaribû heskiriya xwe red bike, ket ser rê. Demek dirêj ew lê digeriya. Da ku kulîlka evîna xwe bibîne. Kela padîşahiya xewnan di dawiya dinyayê de dît. Nîşan bide Padîşahê xewnan - Roman her û her di kela xwe de dihêle û padîşah zeviyek kulîlk da wê keçikê. Dilê Roman razî bû, ew ji bo heskiriya xwe ji her tiştî re amade bû!

Keçik demeke dirêj li benda Roman ma. Salek, du sal li benda wî sekinî, lê hê jî nehatiye. dilê keçikê pir xemgîn bû çavên wê her li hêviya dildarê wê bû. Pir poşman bû ku xwstekeke wiha zehmet ji wî xwest. Ji nişka ve ji xew şiyar bû, li pencereyê nihêrî û zeviyek bêdawî ji kulîlkan dît. Dûv re keçik pê hesiya ku dildarê wê sax e, lê ew dûr bû û ew nema wî dibîne!

Keçikê kulîlkên Beybûnê li her kesî belav kir. Mirov ji ber bedewî û nazikiya wan a hêsan evîndar bûn ji van kulîlkan û evîndaran dest bi texmînkirina wan kirin û niha em gelek caran dibînin ku çawa, yek bi yek pelik Papatya, ji hev tê qetandin û hevok ev e:

“Ew hes dike - ma ew hes nake?

Mîtolojiya kulîlka Beybûn û Berfînê

Berfîn jî mîna zindiyên din dibe dildar. Dildariya wê ya li hemberî tavê roj bi roj pirtir dibe. Ji bo wê gazî Xweda dike û dibêje; ez ji tavê pir hez dikim, ji bo wê dixwazim bibînim..

Jiyan Bozo *

Serbest

Ew hes dike - ma ew hes nake?

Li gorî mîtolojiyê kulîlka Beybûnê di demên kevnar de Cûce (Qezem) ji bo parastina xwe ji şilbûyînê Beybûnê weke sîwanê bikar tanî.

Li vir efsaneya Beybûnê dest pê dike. Carekê keçek hebû. Jixwe navê wê hatiye jibîrkirin. Ew keç pir bedew, nermîn û dilovan bû. Rewiha

*Di sala 1988an de li Amûdê ji dayik bûye, nûçegihaneke beşê ragihandinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

Bejin zirava celîl
Di xwe de kirim êsîr
Tune li cem wê demîr
Min de nehişt hiş û bîr

Hiş û bîr di min de neman
Tevlehev bû çax û zeman
Nema dît min xewa şevan
Hiland im nehîşt im ez nemam

Gerden gerdena gulan
Hilim ji Misk û eqhwan
Naz û letîf û ciwan
Ew bedewa min jiyan

Bedewê agir di dil de dada
Xumarî fîstan li bejnê berad
Lêvan rengê fîstan dida
Kirim serxweş û winda

Ka keç carekê ji caran
Di xew de bibe min mêvan
Bike ji min re selam
Şad bike dil û giyan

Şadiya Dil

Diyar Hemî*

Dil şad dike ew bi ken
Pir xweş dike çax û dem
Wenda dike kul û xem
Dûr dibe êş û kelem

Hem di nav de nûr xuya ye
Hem di rû de şewqa xweda ye
Ji rojê ew ne cuda ye
Heyv ji wê nema xuya ye

Birî bijang û çavên belek
Ew bisk û porê xelek
Dêm û lêvên wek melek
Winad kirim bi carek

Çavên belek e li ser
Nehişt wan di min de ser
Nema dît çavê min der
Sotim ez eşqa dîlber



* Di sala 2002an de, li Kobaniyê gundê Qoşliya Jêrîn ji dayîk bûye, xwendekarê Zanîngeha Kobaniyê, beşê ziman û Wêjeya Kurdî sala sêyemîn.

Ez ê çawa ji te heznekim.
Mihirvaniya te..… kaniyeke bê berdêl e.
Hezkirina te…….. welatê welatan e.
Hestên te……. bewarzîna giyanê ye.

Erê min ji te hez kir… û ji te hez dikim.
Peyv û hevok…
Roman û çîrok…
Helbest û wêje…
Têra wateya bêjeyên ximava pênûsa dilê min… nakin.

Rast e, ez ji malzaroka zikê te nebûm…
Lê ez ji malzaroka ramanên te bûm.
Ez ji te hez dikim…
Ez ê ji te hez bikim.

Ji Te Bûm



Siyabend Siyarojê*

Tu nizanî…
Min ji te hez kir
Lê.. lê ne ji bejin û bala te..
Ne jî rengê te..
Tu dizanî… Ez ji te hez dikim
Te ez ji kabos û pîrhebokên şeva tarî hişyar kirim
Tu di nava xencerên li pişta min diket de…bûyî mertal

Min ji te hez kir..
Çavên te bo min buhareke….
ez jê gulava hingiva jiyanê dimêjim
Dîtina te gul û sîsinan di dilê min de dipişkivîne
Porê te awaza tayên tembûra jiyana min e
Dilê te stargeha min e…. ji bahoza kederê

*Di sala 2003'an de li navçeya mabeta ya girêdayî Efrînê hatiye dunyayê. ji ber êrîşên dewleta tirk û hevkarên wê bi zordarî koçberî herêma şehbayê bû. Niha jî li peymangeha şehîd viyan amara di beşa mamosteyê refê dixwîne.

Jiyana Biharkuj

Cemîl Xoce*

Dibihîzim hawara dil
Feryada ji jana şînê
Dinêrim li wan çavên şil
Dibînim bobelata jînê
Digerim li zeytûn û simbil
Nalîna dayîka kezebbixwînê
Dipirsim ji şahên bêcil
Kî yê bide bihaya vê xwînê?
Dibînim ew çavên kil
Kor bûne ji dûrbûna evînê
Naxwazim bijîm nola mirovên dondil
Bedbîniya tariya bedençirînê
Ditirsim bibînim ew rûyên kavil
Sojiya xemgîniya ji birînê
Deştên lev alandî, girêka herbil
Li xerîbiya bêhêvî û bêhêvînê
Bêkes im, bêxwedî û bêavil
Bê ximav maye pênûsa derbirînê
Rê asê ne, karwan rawetiya nava gil
Zora xerîbiyê dide bin xwe hêviyên vejînê
Êdî naxwîne, dengê jê nayê ew bilbil
Li nav seqem û germahiya zindana axînê

*ji navçeya Mabeta ya girêdayî herêma Efrînê. Di Sala 1993'an hatiye dinyayê endamê. tevlî Saziya Zimanê Kurdî bûye, û ji sala 2013'an ve bûyê mamoştеyê zimanê kurdî. Hewlên wê yên helbeştnivîsandinê ji sala 2017'an ve dest pê kiriye. Ji xeynî wê ew gotinên stranan ji bo hin komên stranan dinivîse

Silo got:

-Belê, ez im Bilo.

Bilo got:

-Silo tu gelekî xweşik bûyî û bejna te dirêj bûye tu weke keleşêran xuya dike.

- Wisa min te winda kir.

- ez nizam çawa bûm ji dengê lawiran me hevdu winda kir.

Lê Silo çîroka xwe ji destpêkê heya dawiyê ji Bilo re got:

-Birayê min ji berê û paşê de dibêjin: Hevalê rêkê kurê dêkê û ez jî hatim van zêran bi te re parve bikim.

Bilo got:

-Na ez razî nebim, xwedê tu dîtî û da te, ez ê herim ji nû ve di wê şopê kevim, ez jî rastî daweta cinan werim û wek te dakevim nava govend û dîlana wan û weke te kirî ez ê jî bikim û wê biqasî zêrên te bidin min.

Silo pir li ber Bilo gerî ku neçe wir. Neçe ez ê para xwe jî bidim te.

Bilo serhişk e, razî nebû bi ya xwe kir û ji nû ve berê xwe da wî çiyayî.

Piştî hefteyekê digihêje wî cihî, dengê dahol û zirnê tê guhê wî, xwe li wî dengî digre û diçe. Dîsa dawet dibe û strana xwe ya ji peyvekê dibêjin:

-Sêşem sêşem sêşem e .

Bilo baş li wan guhdar dike û ji xwe re dibêje:

-Îro duşem e çima ev dibêjin Sêşem e, niha ez ê xwe bidim nava govenda wan û ez ê jî ya rast bibêjim: Duşem duşem duşem e.

De Bilo di aliyekî re xwe di taldê zinarekî re xwe berda nava wan û ket dîlanê, ew jî weke wan di cih de hikdipeke lê ew bi giştî dibêjim: Sêşem sêşem sêşem e.

Lê Bilo bi tena xwe dibêje:

-Duşem duşem duşem e.

Tevliheviyek di nava ahenga wan de derket û dîlan li nav hev ket, qêrîn bi padîşahê cinan ket rûyê xwe tirş kir û çav sor bûn û got:

-Kî ye ev bi nava me ketîye? Daweta me bi giştî li ber zikê hev xist.

Wî got ez nizanim û wî got ez nizanim di encamê de kesekî ew nas nekir.

Ew girtin anîn pêşiya padîşah, padîşah got:

-Tu kî yî? Û tu ji ku ve bi nav me ketî.

Bilo jê re got:

-Padîşahê min ez mirovekî rêwî me, dengê dahol û zirnê hat guhê min û ez hatim û li xweşiya min hat, ez vegeriyam min li daweta we temaşe kir ji geşbûna dilê xwe ez tevlî we bûm.

Padîşah got:

-Em bi giştî dibêjin: Sêşem û çima tu bi tena xwe dibêjî: Duşem?

Bilo got:

-Ji ber ku îro duşem e ne sêşem e.

Padîşah:

-Yanê em bi giştî derewan dikin a te bi tenê rast e?

Bilo bê bersiv ma, wan li Bilo dan ew xiş kirin, tu derên wî sax nehêştin bi giştî şikandin, ew xûzbûna Silo dan ser pişta Bilo û ew weke Silo bû û qewitandin.

Di hin deman de rastî dibe bela serê mirovan û ezezî çi tîne serê mirovan.

qurişekî ne, Silo û Bilo li hev rûniştin gilî û gazinên xwe ji destê felekê dikin, dilê wan bi xort û ewîlên gund ên dewlemend dimîne dest davêjin berîkên xwe, lê berîkên wan vala ne. Ji xwe re gotin:

-Ev ne tu jiyan e, ma rewşa me dê tim wisa be, de ka em serê xwe rakin bi welatekî de biçin, em ê bi pey qedera xwe kevin û rastî karekî werin, em ê demekê biborînin çend qurişan bi xwe re bînin.

Bi ber bayê hevdu ketin ji gundê xwe derketin, hefteyekê bi rê de çûn bi çiyayekî asê ketin, dunya êvar e şev tarî ye, ji dengê ajalan tirs dikeve dilê wan hevdu winda dikin.

Silo tim li Bilo digere, lê nabîne bi nav daristanê de diçe ji dûr de dengê dahol û zirnê tê guhê wî û ber ve wî dengî diçe di taltê zinar û keleman de xwe diqelizîne û li wê meydanê dinêre daweta cinan e, dahol û zirne lêdikevin, dîlan digere padîşahê wan rûniştiye di ber dîlanê re stranekê dibêjin, stran ji peyvekê ye stran wisa ye sêşem sêşem sêşem e.

Ev stran û gevend li xweşiya Silo hat, Silo jî di quncekî re derfet dît xwe berda nava dîlanê, ew jî weke wan di cih de hildipeke xwe radike û li erdê dixe û dibêje: Sêşem sêşem sêşem e

Padîşahê cinan çav li wî dikeve ji nişka ve qîr dike, di cih de her kes radiweste û ew der ker dibe.

Padîşah dibêje:

-Ev kî ye bi nav me ketiye?

-Her kesek dibêje ku em vî nas nakin.

Bi çeplên Silo digrin dibin pêşiya padîşah, padîşah dibêje:

-Tu kî yî û tu ji ku ve bi vir ketiye?

Silo dibêje:

-Ezbenî ez mirovekî rêwî me, min dengê dahol û zirneyê bihîst û wî dengî ez ber bi xwe ve kişandim û ez hatim, min li govenda we meyze kir dilê min geş bû, ez gelekî bi we re şad bûm û ez tevlî we bûm.

Padîşah got:

-Kurê min ji vir û pê ve tu yekî ji me yî, lê çima pişta te xûz e?

Silo dibêje:

-Ji xwedê de ez wisa me.

Padîşah dibêje:

-Were li pêş min rûne pişta xwe daxîne.

Silo xwe xwar dike, padişahê cinan bi hêzeke mezin û qêrînî vêdikeve lepê xwe li xûzbûna wî dixe û xûzbûnê ji ser pişta wî radike

Silo radibe ser xwe bejna wî weke tayê qamûşê rast dibe û pencek zêr dide Silo û dibêje:

-Ev jî para te ye û kengê bixwazî biçî û bê tu yekî ji me yî.

Silo xatir ji wan dixwaze û vedigere warê xwe, piştî demekê gihîşt mal û xwediyên xwe, lê xwediyên wî matmayî man ji ber ku teşeyê wî bi giştî hatiye guhartin û ew xûzbûna pişta wî jî çûye, weke keleşêran xwe venaye li hevalê xwe Bilo pirsî û Bilo bi cih kir çû cem Bilo, lê Bilo jî destpêkê ew nas nekir, Bilo tim li wî nêrî û got:

-Ez ne şaş bim tu Silo yî?

Sêşem

Di hin deman de rastî dibe bela serê mirovan û ezezî çi tîne serê mirovan..

Mihemed Welîd*

Di demeke borî de di gundekî biçûk de du xort hebûn; navê wan Silo û Bilo bûn ji biçûkaniya xwe de destbira bûn, gelekî ji hev hez dikirin. Lê Silo kinik û pişt xûz (qembûr) bû. Ew di gund de bê kar in bi hesret û kedera

*Di sala 1976î de li navçeya şera ya girêdayî herêma Efrînê hatiye dunyayê. Endamê yekîtiya rewşenbîrên Efrînê ye. Helbest û çîrokan dinivîse, niha sê pirtûkên wê hene. Herwiha ew hunermend û dengbêje jî.

-Qertmîn....Axxx….Û ax Qertmîn!

Bivirê êzing birîne, ji destê xortan digirt, bi herdu destan bibanî dixist û bi himeta xwe ditanî xwar!....Heger qurm li ber bivirê wî parçe bûba, hingê serê xwe bi şanazî hildida û digot:

-Bavoo…Ev çi ye?!...De welahî li Qertmînê bivirê min nedibû du car!

Û heger bivirê wî vale di çû, bi axînek germ re, pişta xwe rast dikir û bi tengezarî digot:

-Axxx…Ava Qertimînê!....Ava binxetê, xwîn li me weravt!

Di çaxên werzan de, ku petîx di pişkivîn, petîxekî destarikî bi destekî digirt û li dora xwe di zîvirî û bi dengekî bilind digot:

-De êdî Welahî, yên Qertmînê du caran ji vî petîxî girtir dibûn!

Di ser kaniya avê re, ya ku di ber çemê Nisran de, ku bi destên şivanên gund hatibû vedan, di sekinî û bi keser digot:

-De bi navê Xwedê kim, liba tirî di nav ava kaniyên Qertimînê de dişeqitî!...Ava zelal…Zelal û cemidî, wek ava Zimzimê!

Sal derbas bûn û Seyid hîn ji vî pesnî û ji vê cudabûnê nehatiye xwar, heya wê sala ku mirovek ji gundê Nisran, ew jî cîranê Seyid bû, bi barê qaçaxê re gihişt gundê Qertimînê û piştî çend rojan li Seyid vegeriya û li ber wî û gotina Qertimînê ma guhdar!

Li ber siha camiya gund, di nav koma gundiyan de, wek tora xwe car dî Seyid xwe kuxand û dest bi axeftinê kir û di nav re ket pesnê warê xwe!...

-De Welahî li Qer..

Cîranê wî axeftina wî bi ken birî û got:

-Xalê Seyid Xelîl, min Qertmîn dît!

Çavên Xalê Seyid, pêre pêre bi vê gotinê re ronî dan û bilez pirsî:

-Êêê…..Kaniya li rexê rojhilat……Dara Tûyan dinîvê gund de…. Xaniyê me?

-Kuroo Xalooo…Kaniya çi …Dara çi û xaniyê çi….De Welahî gundekî ziwa û sor, xaniyên kevirî bi ser hev de hêrivî û kambax!... Gundekî gijilî!....De bi Xwedê kim, dema ti diketî nav pesnê gundê Qertimînê de, min digot aniha qoziyek ji bûhiştê ye!

Çavên Seyid, ji çend rondikên hûr şilbûn û li xort nehêrt û bi keser berisva wî da:

-De lawê min, were ji vî dilî re bibêje!....De welahî li ber dilê min Qertimîn buhişt bû!… Û wê di vî dil de heya mirinê bimîne buhişt!.....

Axxx...War

"De lawê min, were ji vî dilî re bibêje!....De welahî li ber dilê min Qertimîn buhişt bû!...



Abbas Abbas*

Seyid ê Qertmînî, ji gundê Nisran, li binxetê, xwe tev her kar û axeftinê dikir, pêre jî diket nav pesin û xweşiya gundê xwe de, gundê ku ji dema fermanên reş ve, li serxetê bi malbata xwe ve jê koçber bibû:

*Nivîskar, sala 1946an li gundê Nissran / herêma Qamişlo ji dayîk bûye, du salan li Zanîngeha Şamê felsefe xwendiye, paşî koçeberî Almanyayê bûye. Çend pirtûkên wî (Kurteçîrok, şano, roman) bi zimanên kurdî û erebî hetine çapkirin

bişikîne, hewl da ku çûyînê heya ber êvarê dereng bixe lê keça wê birik bû, lewma çare nedît, heya ku taştê xwerin û seyare hat dem ber bi nîvroyê ve çû bû.

Zîlanê gazinca derengmayînê kir, lê dayîka wê ew qayîl kir bi gotina ku ew hîn li dibistanê ne û heya bigihêjin dê ji dibistanê derbikevin. Lê berî gihîştina wir dengên teqînan hatin, şofêr got ku çeteyên dewleta tirk herêmê topbaran dikin û mecbûr ma vegere.

■ Taploya Erdelan Ibrahîm

Giriya Zîlanê nikarîbû şofêr bihêle ku ber bi mirinê ve biçe, û keça biçûk dilşikestî vegeriya cihê xwe.

Her kesî dizanî çi bû negengaz bû ji Zîlanê veşêrin, Şehba giştî tevlî merasîmên zarokên şehîd bû.

Muşekên dijmin vê carê zarokên dibistanê hilbijartibûn, 8 zarok bûn Şehîd û di nav de jî Mihemed û Arif hevalên Zîlana biçûk.

Dê kê agirê dilên dayîkan vemiranda, dê kê bi Zîlanê bida fêmkirin ku ew mirin nesîba hevalên wê bû.

Di Merasîman de Zîlan neqîrî, û lewaz neket, dayîkê bawar nedikir, di çavên wê de çirûskek xuya bû, lê kesî nedizanî ew çirûsk çi ye.

Di merasîma 8 Zarokên Şehîd de Zîlan negirî, tenê hêdî hêdî ber bi tabûtan ve meşiye, ber bi wêneyên hevalên xwe yên ku bi ser tabûtê ve daliqandîbûn sekinî, li çavên wan meyze kir, rûyên wan ramûsand û vegeriya ba dayîka xwe.

Dayîka Zîlanê tenê giriya, keça xwe hembêz kir û giriya weke hemû kesên ku hatibûn mezelê ta zarokên şehîd oxir bikin.

Piştî çend rojan ji komkujiya zarokan, Zîlan wenda bû, dayîk û her kes lê geriyan, ne dibistan hiştin û ne jî konên koçberiyê, kesekî nedîtibû ku Zîlan li ser goristana zarokên şehîd e jî.

Gotin asayîşê parçeyên laşê keçeke biçûk li ser sînorên vegera Efrînê dîtibûn, wan dengê teqîna mayînekê ber destê sibehê bihîstibûn, lê nedizanîn ku Zîlana biçûk pêl mayînê kiriye, nedizanîn ku wê dixwest vegere Efrînê û li hevala xwe Sema bigere û jê re çîroka koçberiyê û zarokên şehîd vebêje.

lewaz bûn û wê nedikarî wendakirina hevala xwe Sema di şerê Efrînê de ji bîr bikira, her tim bi hev re bûn, di çûyîna dibisatanê, korsên mûzîkê û leystikan de.

Di şer de malbata Zîlanê koçberî Kampên Şehbayê bûn, û malbata Semayê li Efrînê ma û agahiyên wan ji hevdu qut bûn, hinekan digotin di topbaranê de jiyana xwe ji dest dane, hinekan digotin ew hatine binçavkirin bi destên çeteyan, hikekan jî digotin ku derketine derveyî welat. ya girîng ew bû ku nema Zîlan bi Semayê re dilîze û ne jî diçe dibistanê û korsên mûzîkê.

Zîlan pir kûvî bibû, guhdar dê û bavê xwe nedikir, ne jî bi hevalên xwe yên nû re dilîst, bi zorê diçû dibistanê û her roj bi şagirtên refê re şer dikir.

Dayika wê nedizanî dê çawa pêre têkildar be, heya ku bihîst dê Zarokên Efrînî yên koçber li kampa Berxwedanê wêneya herî mezin ya zarokan di cîhanê de xêz bikin bi dirêjahiya 205 metreyan di bin navnîşana NEQŞETILIYÊN ÊŞÊ û bi beşdariya zêdetirî 2000 zarokên koçber.

tevî ku dayîka Zîlanê navê çalakiyê ne baş dîtibû ji bû zarokan, û nedixwest ku deriyên êşan li zarokan werin vekirin, digot:"pêwîst e ev zarok li ser hêviyê û hezkirina jiyanê bêne perwerdekirin ne li ser êşê". Tevî wê jî wê navê Zîlanê xiste nav lîsteya zarokên beşdar bi hêviya ku ji wê rewşê derîne. Di roja 2 / 9 / 2019an de cilên herî xweşik li bejna Zîlana xwe kir û berê xwe dan Kampa Berxwedan.

Hewayeke xweş bû, rengên cuda, zarokên xwedî hêvî, kaxez û konên kampê nîşana penaberiyê.

Li ser pelên zarokan hêdî hêdî wêne hatin xêzkirin, Zîlanê cihê xwe di nav du zarokan de girtibû, û xuya bû ku rewş li kêfa wê hatibû.

Dayîkê ji dûr ve dît ku keça wê û herdu zarokên din bi alîkariya hev wêneyekê xêz dikin, cara yekê bû piştî penaberiyê dît ku ken cihê xwe li ser rûya wê digire.

Piştî bi dawîbûna Tabloyê ber bi wan ve çû, dît ku wan dîmenek ji xwezaya Efrînê xêz kirine; çiya, çem, dar, kulîlk û 3 zarokên xweşik bi destê hev girtine û dilîzin, bêlî bû ku ew zarok nîşana wan bû.

Di wê demê de dayîkên zarokên din jî hatin ba wan û Diya zîlanê xwest ku bibe heval bi dayîkên herdu zarokan re ta her demekê keça xwe bibe gel wan ku ji rewşa xwe xelas bibe, û wisa bû.

Zîlanê jî hevalên xwe yên nû bi dayîka xwe dan naskirin, navên wan Mihemed û Arif bûn, û piştî koçberiyê li Tilrife'tê nîştecih bibûn.

Tevî ku Tilrife't hinekî ji wan dûr bû jî lê dayîka wê her demekê ew dibir cem hevalên wê yên nû ta rewşa wê gelekî baş bû û êdî bû keçeke dilşad.

Lê ji ber mirin çavteng e û şadî ji kesî re namîne, hemû xirabiya xwe bi ser dilên belengaz de berdide ew bûyer çê bû. Roj Duşem bû 02.12. 2019 an, sibehê zû Zîlan Rabû û ji dayîka xwe re got ew ê neçe dibistanê wê rojê, û tika jê kir ku wê bibe Tilrefe'tê ta ku hevalên xwe bibîne, dayîk matmayî ma, lê nedixwest ku dilê keça xwe

Veger

Selam Hisên*

Nedizanîn ku wê dixwest vegere Efrînê û li hevala xwe Sema bigere û jê re çîroka koçberiyê û zarokên şehîd vebêje..

Wisa ye şer, her tiştî bi rengê xwe dike, kesekî texmîn nedikir ku mûma kenê dê li ser lêvên Zîlana biçûk vemire, û dengê şadiya wê dê kirasê bêdengiyê li xwe bike.

Zîlan biçûk bû, 9 salî bû lê şer Zarokan zû mezin dike û bareke giran çedike ser milên wan, milên Zîlanê

*Çîroknivîs û romanivîs, di sala 1988an de li bajarê Efrînê ji dayîk bûye. Di sala 2009an de di Zanîngeha Helebê de ji beşa Wêjeya Erebî derçûye. Bi herdû zimanên kurdî û erebî dinivîse. Ji berhemên wî yên çapkirî: Bi zimanê Kurdî: Sêdarên Bajarên Sêwî (komçîrok-2019) û bi zimanê erebî: Gunehên Kulîlkên Zeytûnên (Roman-Tûnis 2018), 7ê Kobeyê (Roman-Cezayêr 2019).

çîn derdikevin; çîna serdest, zalim ku ji çanda xwezayî dûr e, û çîna bindest ku ne bindest e, lê wiha nav lê kirine, ne çîn e jî, lê wiha nav lê kirine ku jin e, ew e ya ku paşketî û dema wê qediyaye. Pevçûnên mezin di navbera van herdu hişmendiyan de hene. Lewma çanda resen ku ser hêmanê jinê pêş dikeve, dikeve xeteriyê de. Em dikarin bibêjin ku dema çand tê qirkirin ji hêla hêzên kapîtalîs de, armanca sereke çanda jin – dayikê ye. Di rê û rêbazên pergala kapîtalîzmê de di bin navê pêşketin û modernîteyê de dixwaze dawî li mîrateya çanda jin – dayikê bîne. Ev yek bi rêbazên ku jin bixin şûna metayekê de. Tenê di bin navê jina azad de, lê berevajî jina bê serûber a ku ji rastiya xwe ya çandî dûr e, jina ku li dijî xwezaya xwe ya civakî ne afrîner e, jineke ku tenê fîzîka wê weke azadiyê tê nîşandan lê felsefeya jina civakê jina azad li holê nîne. Birastî di şerên ku di Rojhilata Navîn de jî diqewimin tenê jin û zarok dibin qurbaniyên vê hişmendiyê. Bêguman şerên ku li tevahiya cîhanê jî lidardikevin. Mînaka li ber çavên me: Somal, Afganistan, Pakstan û gelek welatên cîhanê. Çendîn pîvan û çandên sexte ku ji derveyî çanda jinê ne têne ferizkirin. Em dikarin bibêjin ku şerê herî giran şerê çandan e. Ji ber ku çanda serdest her dixwaze xwe bi hebûn bike. Zindî bimîne. Eger berê çanda serdest bi rê û rêbazên çor xwe dida nîşandan, lê di vê sadsala 21 mîn de hîna bi ziravî û zanebûn nêz dibe. Di qadên çapemenî, çand û huner û sporê de gelek xapandinên civakê pêşdixin. Hem jî teknolojiya ku pêşxistine ne kêm e.

Eşkere em dikarin bibêjin ku pevçûnên sereke di navbera Çanda sexte – Çanda jin – dayikê de heye. Eger çanda jin dayikê venegere wê dawiya civakan ne bi amûrên şer were, wê tenê di qalikê ku hundir vala de bimîne. Rêber Abduah Ocelan dide diyarkirin ku; "Eger tasik şikest wê av tê de nemîne". Di vê wateyê de eger çand hate perçekirin, tunekirin, wendakirin wê jiyan û civakbûyîn jî nemîne. Berxwedaniya herî mezin a "avê " ye, di wateya jiyanê de. Jin bi rastiya xwe divê li ber xwe bide. Çanda xwe biparêze. Civakbûyîna xwe bi hebûn bike. Ji xwe çanda jin – dayikê nemîne wê tenê civakek ji meta û robotan bimîne. Wê demê em nikarin behsa hebûna mirovî bikin, ango rihê axê, dengê avê, dengvedana jiyanê. Gava çanda jinê tarî bibe, jiyan jî tarî dibe. Xweza bê qîmet dibe. İnsan, zarok, temenmezin û ciwan ji wateya xwe derdikevin û rastî dibe mîna çolekê ku tu jiyan lê namîne. Eger di çolên ku em dizanin de sebar jî hene û avê di nava xwe de dihewînin, lê jiyaneke bê çanda jinê, wê neşibe wê çolê jî. Wê zuha û di nav tozê de bê jibîrkirin. Lewma berxwedanî stûna bingehîn e ku jin bi xwe, xwedî li çanda xwe derkeve û zanebûna "xwe" ya xwe kûr bike. Çanda resen a jin – dayikê mîrateyeke dîrokî, xwedîderketin li wê çandê dernekeve tunekirina wê mîrateyê bi xwe ye.

gundewarên çiyayên Zagrosan diyar dikin ku; piranî navê pincar, gul û kulîlkan hetanî bi navê çavîk û kanîkên avê jî navên mê li wan hatine kirin. Mînak weke: Pincara bi nvê Lîloz. Gula bi navê Sulbiz. Guleke din gelek spehî ye bi navê Şilêr. Xala ku mijara gotinê ye ew e; jin – dayikê şopên xwe li her deverê bi awayekî xwezayî hêliştiye. Di dergûşa mirovahiyê de çanda xwe avakiriye. Di nav hemû şert û mercan de jinê du taybetmendî parastine ya yekemîn ew xwedîkirin, ya duyemîn parastin. Di nava herdu taybetmendiyan de jiyaneke komî avakiriye. Jiyana komî – komik di wateya jiyana wekhev, hevbeş û xweşik kiriye çandeke komînal a ku bû bingeha avakirina civaka ser hêmanê dayikê.

Rastiya ku nehatiye ser ziman ew e ku jin ewqas xwediya hêza jiyanê ye, bi xwere zilam jî xwedî kiriye. Lê paşê zilam ji rê derketiye û derbasî çîna serdest bûye. Çanda jin – dayik bû mîna felsefeyeke jiyanê ku her kes di nav wê komê de rehetî, aramî û ahenga xwe tê de bibîne. Lewra her çendê zilam; ango bav da du nêçîrvaniyê û li du hêza fîzîkê ket, lê zarok û kom her dora dê man. Çanda dayikê bi awayekî xwezayî ne çînî û bi zorê hate avakirin. Loma em dikarin bibêjin ku çanda resen a civakê jin – dayik e. Birastî dema em diçin nav zoman; ango koçerên li qontara çiyayên Zagrosan hetanî vê demê jî hîna dayik pez xwedî dike, zarokan mezin dike, hûrde – wirde ya jiyanê, ji pincarên xwezayê dermanan çêdike. Ew dayik mîna hekîmekê ye, xwedî li hemû pirsgirêkên eşîrê, komê, qebîlê, malê, malbatê û civakê derdikeve. Ne tenê çanda xwarin û dermanan li pêş xistiye, her wiha cil û bergên bihar, havîn, payîz û zivistanê jî ji çavkaniyên xwezayê afirandiye. Li gorî her demsalekê çanda cil lixwekirinê afirandiye. Ya herî balkêş jî ku jin – dayikê ji cil û bergên rengîn hez kiriye, rengên ku dişibin xwezayê, kulîlkan û biharê. Ji gulavan spehîbûna por keşif kiriye, hetanî bedewiya çermê laş û rûk jî gelek merhem çêkirine. Ev çanda resen ne tenê li Kurdistanê, hetanî vê kêliyê jî hîna komên ku bi rêveberiya jinê li kevîkên Nîlê hene. Ji %80 ew dayik miloxiyê diçînin, difroşin û debara malabtên xwe dikin. Her wiha ji giyayan biharat, îsota hişik, kizbera û kemûnê çêdikin. Eger em li welatê Rojhilta Navîn van nimûneyên zindî dibînin, lê belê hetanî li Çînê ku ji %90 jî jin pembo, kulîlkan, fêkî û pincaran xwedî dike û lê miqateye. Li ku derê be jinê hestên xwe û hizir û hişmendiya xwe ji xwezayê qutnekiriye.

Gava em vê heqîqetê radixînin ber çavan li tevahiya cîhanê heta niha jî çanda jin – dayikê xweser û azad berdewam nekiriye. Ji ber ku pergala li dijî wê ferlsefeya afrîner, hişmendiya ku di nava xwe de çanda kapîtalîzmê ku li ser navê pêşketinê xwe bi nav dike de, dijebriya wê dike û bi aqyên zirav dixwaze tune bike. Du

Jin û Mîrateya Çandê

Çanda resen a jin – dayikê mîrateyeke dîrokî ye, xwedîderketin li wê çandê dernekeve tunekirina wê mîrateyê bi xwe ye.

Nêrgiz Ismayîl*

Jiyana mirovahiyê li ser heqîqeta jin – dayikê xwe lipêşxistiye. Jinê, ne tenê ji ber zarokanînê dayiktî kiriye, zarok aniye û xwedî kiriye, di heman hestan de lawir û çi keskahiya li derdora xwe jî hem lê miqate bûye, hem nav lê kiriye. Balkêşiya vê rastiyê ku bi taybetî jî hetanî niha li derdorên

*Nivîskar û rojnamevan, Di sala 1975an de li Qamişloyê hatiye dunyayê, hetanî dibistana navîn xwendiye, di pêvajoya biçûkaniya xwe de di nava xebatên çand û hunerê de maye, piştre tevlî şoreşa azadiyê dibe, karê wêje û ragihandinê dike, çend pirtûkên wê yê çapkirî di aliyê (Roman, Helbest, Pexşan) hene.

Navê pirtûkê: Leyla û Mecnûn
Nivîskar: Şêx Mihemed Can
Amadekar: Mehmed Emîn Hîvîdar



Naverok: Klasîk

Şêx Mihemed Can nêzî 140 sal berê pirtûka "Leyla û Mecnûn" amade kiriye û niha ew pirtûk bi tîpên latînî li ber destên xwendevanan e.

Şêx Mihemed Can di sala 1857'an de li gundê Aqtepe ya Amedê hatiye dinê û di sala 1909'an de miriye. Wî di jiyana xwe de dersa olî daye gelek şagirtan û di wê serdemê de hin pirtûk jî amade kirine. Yek ji wan jî "Leyla û Mecnûn" e. Ev pirtûk niha bi amadekirina Mehmed Emîn Hîvîdar ji Weşanên Dara derket.

Şêx Mihemed Can di sala 1884'an de ev pirtûk nivîsandiye. Pirtûk ji 20 sernavan pêk tê û ji 1879 beytan (malikan) pêk tê. Wî bi wezna arûzê û bi şiklê mesnewiyê pirtûk honandiye. Amadekarê pirtûkê Hîvîdar dibêje "Armanca Şêx Mihemed Can bi vê pirtûkê ew bûye ku zimanê kurdî bilind bike."

Çîroka Leyla û Mecnûn li Yemenê dest pê dike. Çîroka wan a evînî heta niha ji bo gelek pirtûkan û her wiha ji bo fîlman bûye mijar. Yek ji wan pirtûkan jî ev e ku niha bi latînî hat amadekirin. Pirtûk bi cureyê mesnewî çîrokê bi kurmancî pêşkêş dike.

Hejmara Rûpelan: 336 rûpel
Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanên Dara / 2021/

Navê Pirtûkê: Hûmîtra ..Felsefeya Hunerê ya Mîhri Mîtra

Nivîskar: Xecê Şen



Naverok: Felsefe

Nivîskar Şen mijara Felsefeya hûnerê ya Mîhrî-Mîtra girtiye dest.

Li ser berga pirtûkê têkildarî cewherê pirtûkê ev nîşe hatiye nivîsîn: "Felsefe û fikira Mîhrî-Mîtrayî weku dîrokeke xwedî zêdetir 12-15 hezar sal berî zayînê li ser çiyastanê "Zagroz"ê xûliqiye. Lewra em dikarin weku maka hemû felsefeyan bidin pênasekirin. Divê em vê şahnazî û rewayetiyê bidin xwe ku em bibêjin welatê rojê anku Kurdistan hêlîna yekemîn a fikir, felsefe û şaristaniyê ye, dergûşa felsefeyê Kurdsitan e û hin welat tenê belavkar û geşedarên felsefeyê bûne. Helbet Mîhrî-Mîtrayî felsefeya kevintirîn a kurdan e.

Bawerî, fikira xwezayî û xwezaperwerî anku Mîhrî-Mîtrayî ku hêz û baweriya xwe ji hîv- rojê digire, bingeha xwe li ser her çar axşîgên "as, ax, aw, ar"ê avasaz kiriye. Heta îro jî felsefeya mirovahiyê xwe disipêre felsefe û bîr û baweriya hîv-rojê û ya her çar axşîgên "as, ax, av, ar"ê û hebûn – xwebûna xwezayê. Felsefe û rêbaza Mîtrayî hem weku fikir û hem jî weku rêbaz û ol ji bakur gihişte yewnan, Ewrupa û hetanî Englîstanê û li rojhilatê jî hetanî welatê Çîn û Japonê û li başûr û rojavayê başûrê jî hetanî Şam û Misir û jêrîna wê kanî fikir û felsefeya xwe dakût û şênber kir. Ewrupa hetanî hatina Îsa Mesîh, nêzî hezar sal li ser fikir û rêbaza felsefeya Mîhrî-Mîtrayî bû.

Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanxaneya Aramê /2021

Navê Pirtûkê: Di Rojhilata Navîn De Îdeolojia Qirkirina Etnîkî

Nivîskar: Dilşad Murad

Wergera ji Eerbî: Hişyar Murad

Naverok:

Nivîskar mijara qirkirina di Rojhilata Navîn de bi berfirehî digire dest û qirkirinên bi navûdeng ên li herêmê tên naskirin, ne tenê weke çîrokekê tîne ziman. Nirxandin û analîzeke zanistî dide vê mijara metirsîdar. Bi pêşkêşkirina nêrîn û analîzeke kûr, balê dikişîne ser îdeolojiya ku dibe bingeha van qirkirinan, de destpêkê de dest bi nîqaşkirin û redkirina bingehên îdeolojiya rêjîmên desthilat di Rojhilata Navîn de dike. Bîrdoziya ku bawerî û netewperestiyê ji bo xapandina miletan bi armanca gurkirina şerê di navbera wan de dike amûr analîz dike.

Paşê nivîskar di pirtûka xwe de li ser rola Rêjîma Navdewletî ya Hegemon a domandina şerê di navbera miletan de eşkere dike. Gelek mînakan li ser rola wê ya dermirovî pêşkêş dike.

Her wiha behsa gelek qirkirinên di Rojhilata Navîn de dike bi taybet ser miletên ermen, kurd, suryan, keldan û asûr.

Di dawiyê de, ji bo nivîskar bi rola xwe bi temamî rabe çend xal û rêyên çareseriyê pêşkêşî miletan dike ji bo bi rêya wê karibin li hemberî siyasetên qirkirina etnîkî rabin. Xalên çareseriyê jî ev in: Berxwedana giştî, rêveberiyên demokratîk û yekîtiya miletan.

Hejmara Rûpelan: 244

Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanxaneya Şilêr, Qamişlo-Sûriye, çapa yekem 2021'ê

Pirtûkên Derketî

Navê Pirtûkê: Avdana Agir
Nivîskar: Zerdeşt Heybet (Rizgar)
Naverok: Helbest

Ev dîwan helbestên ku hevalê Zerdeşt di dawiya 1970'î de û destpêka 1980î de nivîsandine .

Di xwendina helbestên dîwanê de mirov pêşveçûnên bilez û xurt ên li Kurdistanê û herêmê dihatin jiyîn dibîne. Tê de behsa zulma rêjîma Baas û Erebkirina perwerdeyê li dibstanên Sûriyê dike. Her wiha behsa komkujiyên Seddam yên li Kurdistana Başûr dike û dema ku li Bakurê Kurdistanê çirûska şoreşa bi pêşengtiya Mazlûm û Egîdan dest pê kiriye dike.

Di helbestên hevalê Zerdeşt de em ruhê welatparêziyê û lêgerîna şoreşgeriyê û biryarbûnê em hîs dikin.

Hejmara Rûpelan: 164
Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanxaneya Şilêrê /2021/



Navê Pirtûkê: Xezala Kurdan (Çîrok û Xebroşkên Cizîra Botan)
Berhevkar: Dildar Botî
Naverok: Folklor

Di vê pirtûkê de bi dehan çîrok û xebroşkên Cizîra Botan hene. Her keresteya di vê pirtûkê de, bi zimanê xwe yê resen û herêmî çêjeke din dide me. Xezala Kurdan, çîrokeke balkêş e ku navê xwe daye vê pirtûkê. Çîroka Seydik û Şêxigo Malî jî du çîrokên pexşankî û kilamkî ne. Qeto û Keçelok jî hem ji hêla zimanê xwe ve hem ji hêla naveroka xwe ve du xebroşkên balkêş in. Her wiha gelek keresteyên vê pirtûkê cara ewil e ku di nava arşîva folklora me de cih digirin.

Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanxaneya Wardozê /2021



xwe wenda dike; bi nekarîna têgihîştina rastîn û ya xeyalî; bi tevlihevbûna paşeroj û ya niha; bi atmosfera xwe di navbera dûmanên afyonê de diguhere û vediguhere; bi rewşeke melankolîk, reşbîn, tarî; bi hêrsbûna xwe rastiyê neyênî ji xwendevanan re raber dike.

Sadiq Hidayet, ku edebiyata Iranî kir beşek ji edebiyata cîhanê û wekî "Kafqayê Rojhilat" tê qebûl kirin berhemên hêja afirandin. Lê çi heyf ku xwe kuşt. Xwezî wî xwe nekuşta û gelek berhemên din jî biafrandana.

Kundê kor; yek ji romanên herî balkêş ên sedsala bîstan e. Bi çavekî hişk û helwesteke xwînsar mijûlbûna bi drama ferdê nûjen; ku nakokiyên hundirîn ên mirovan ronî dike. Kundê Kor di xew û şiyarbûnê de ji du beşan pêk tê. Lê xewn çiqas dijwar e ku ji rastiyê were cudakirin, ew qas jî balkêş e ku rastî rast be. Ev çîroka kesekî bêzar û bêhnteng e ku hem ji duh ve perçe bûye û hem jî pêşeroja wî tune ye.

Di bingehê xwe de, Kundê kor, xebateke ku tê de ew (Sadiq Hîdayet) û rewşenbîrên ku ew temsîl dike ji civaka ku bi rewşenbîrî ve pê ve girêdayî ne, lê ji civakê veqetiyane rave dike.

Kundê Kor romaneke reşbînî ye, bedbînî ye, xweşbînî nîn e. Tê de derd, kul, keder, xemgînî û êş hene. Pesîmîzma bêdawî û dîtina melankolîk a jiyanê ya vizyona bilind ji bo xwendevan bêguman ezmûnek şok e. Romana Sadiq Hîdayet xebateke afirîner û berhemeke balkêş a wêjeya nûjen a Iranê ye.

Sadiq Hîdayet di romana xwe ya bi navê Kundê Kor de, bêhêvîtiya kesane, hundirê wî, zindana wî li cîhana ku wî afirandiye, nakokî û nakokiyên ku ew di têgihiştinê de dijî bi zimanekî wêjeyî nivîsiye û pêşkêşî xwendevanan kiriye..

Di romanê de, serpêhatiyên kesê ku xwe berdide tunebûnê û nikaribe qelsî û zextên xwe ragire tê vegotin.

Sadiq Hîdayet nivîskarê herî girîng ê wêjeya Iranî ye. Wî pirtûkên bi hişmendiya rewşenbîrî nivîsandine. Gelek berhemên wî, zêdetir ji carekê hatin çapkirin û wergerandin li zimanên cihê yên cîhanê.

Kundê Kor, romaneke wêjeyî ya pircure ye ku mirov li kûrahiya zayendîtiya xwe bigere û wê bi wateyeke fantastîkî ve bi xwe ve girê bide. Mirov dikare bibêje ku romana Kundê Kor berhemeke surrealîst e. Vegotineke gunehkar ku tê de rastiya bi xewnan pûç bûye bi siya, deng û halusinasyonan ve girêdayî ye.

Ez ê nivîsa xwe bi gotinên van herdu wêjevanan bi dawî bikim. Philippe Soupault dibêje: "Di edebiyata xeyalî ya sedsala bîstan de şahesereke." Û Andre Breton jî dibêje: "Ger tiştek wekî şaheserek hebe, ev e".

civakan ve wekî xirab tê binavkirin, di hin civakan de jî bi wateyên pîroz tê naskirin. Her çiqas bi gelemperî tê fikirîn ku ew mirinê vedibêje, ew bi rastî celebek çûk e ku bi xwarina gelek zindiyên ku dikarin di xwezayê de zirarê bidin me qenciyê dike.

Kund; Li Mezopotamyayê, ew Xwedawenda Felaketê, Lîlîth, ku gelên Mezopotamyaya kevnar teşwîq kir ku bawer bikin ku hebûna wê nîşanek karesata hatinê ye, Sembol kir. Ev Kevneşop hîna jî li Anatolya û Mezopotamyayê heye.

Kundê Kor a S. Hîdayet, ku hinekan wî wek Kafkayê Rojhilatê bi nav kirine, mîna ku ji bo baweriya giştî piştguh bike dibêje, "Di jiyanê de birîn hene, birînên gemarî hene ku hêdî hêdî û di tenêtiyê de mîna kotîyê canê xwe dixwin. Ev derd ji kesî re nayê gotin. Ji ber ku hîn derman û dermanê van derdan tune ye."dest pê dike û ew bi hestekî kûr berdewam dike.

Sedema ku wî/vebêjer nivîsandiye; vê yekê wekî xwestiye "xwe bide nasîn" bi siya çiraya ku li ser dîwêr hatiye pêşandan rave dike. "Ma mirov û siya wî ji hev cuda ne?" Hûn nikarin lê bifikirin. Siya min ji min re mîna yekî zêde ku nikare xwe ji gotinên lîstika pêşnivîskî xilas bike xuya dike.

Kêmasiyên di têgihîştina wî ya li ser cîhana derve û xwendevan di van rêzikan de nezelaliya xewn û rastiyê dibîne. Hûn dikarin bibînin ku karakterên bav, ap, pîrejin, goristan û vebêjer di xêzeke ku ji têgînên zeman û mekan serbixwe hatiye teşekirin de cih digirin, bi rastî jî kesayetên yekane ne ku di jiyanê de rolên cihê girtine ser xwe.

Carinan mirov di vê jiyanê de vediguhere tiştê ku jê nefret dike. Bo nimûne, dibe ku normal xuya bike ku yekî ku di nihêrîna pêşîn de ji goşt hez nake, dema ku dibîne qesab dema goşt jê dike, nefret dike. Lê heman kes ji vê çalakiyê hez dike dema ku rojekê kesek dikuje, nakokiyên jiyanê bi awayekî îfade dike. Mîna ku vebêjer di xebatê de dike.

Çîrokbêj bi keça xaltîka xwe re dizewice, tenê ji ber ku ew dişibe xaltîka wî ya delal ku ew mezin kiriye. Lê ew vê êşê dikişîne tevî ku dizane jina wî qet ne ya wî ye, her tim wî dixapîne. Bi rêzikên xwe yên ku di nav wan de êşên bêdeng dijîn vedibêje, di kûrahiya peyvan de hesteke zordestiyê li xwendevan dike.

Wergêrê kurd Muhsîn Ozdemîr dibêje: "Deng û rengê qîrînekî ye romana "Bûmê Kor", "Kundê Kor", ji bo dilê evînê û warê wêjeyê çavkaniyeke mezin û tiptije ye. Qala êş û hêviya hezê dike, peyv û newayên xwezaya jiyanê dirêj û xuya dike."

D. Lashgar dibêje: "Di dilê karakterên ku Sadiq Hidayet afirandî de du hêzên ajotinê hene; bi xwestina afirandinê bêne jibîrkirin, û bi xwestina mirinê vekişin nav çermê xwe."

Kundê Kor tenê berhemeke "bêhempa" ye, bi lehengê xwe yê ku hişê wî hêdî hêdî ji hev dikeve û yê ku nasnameya

ne. Wek tê zanîn Kawa Nemir pirtûka Soneyên Shakespeare wergerandibû û tê de guhertinên ecêb çêkiribûn û lewitandibû. Navê Cegerxwîn û navên gelekên din xistibû nav pirtûka Shakespeare sonetan. Yekî ku nizanibe dema bixwîne dê bibêje qey wan tiştan Shakespeare bi xwe nivîsiye.

"Kundê kor" romaneke bi nirx e, hêjayî xwendinê ye. Naveroka wê û awayê vegotina ravekirina wê hunerî ye, wêjeyî ye. Vebêjê romanê hunermendekî wêneçêker e û gelek xeyalperest e. Ji xwe wêneçêkerên ku tabloyên hêja çêdikin bi saya xeyalan çêdikin. Xeyal îlhamê dide wan û ew jî hunera xwe ya hêja pêk tînin.

Vebêj bi siya xwe re diaxive, lê di bingeh de xwe de ew bi xwendevanan re diaxive/dipeyive, bi wan re dikeve nav diyalogê. Ew dibêje: "Nivîsandin ji bo min pêwîstiyek û karekî mecbûrî bû...Min dixwest tiştê ku min kişandibû binivîsim ser kaxezê….piştî çend dudiliyan, min çira nêzîkî xwe kir û dest bi nivîsandinê ki. Ez dixwazim derdê xwe li ser kaxizê binivîsim. Divê ez çîroka xwe vebêjim, lê ez ji ku derê dest pê bikim? Jiyan ji bo destpêkirinê kurt e, ew çîrokek e."

Rastî jî ji bo hinek nivîskaran nivîs bûye şêweyê jiyana wan. Divê ew binivîsin. Ew bênivîs nikarin bisekinin. Gelek romannivîserên xeyalperest romanên xwe bi xeyalan dixemilînin. Ew ji ber rastiyên civakî û bi xeyalên xwe yên lêzedekirî romana xwe dihûnin. Sadiq Hîdayet jî bi vî şêweyî û bi awayê lihevdu hunandina rastî û xeyalan romana xwe nivîsiye, berhema xwe afirandiye.

Vebêj/nivîskar Sadiq Hîdayet ji mirinê hez kiriye, mirinhez bûye, lewma paşê xwe kuştiye, întîxar kiriye. Ew dibêje: "şeraba binefşî, axuya mirinê, çavkaniya hizûra herheyî..mirin ji min re ew çend normal û xwezayî xuya dikir."

Di nav rûpelên romanê de jî qalkirin û ravekirina mirinê, kuştinê gelek e.

Vebêjê xeyalperest guherandina dunyaya xwe dixwaze. Ew dibêje: "Cîhana rasteqîn ji min dûr diket, Ez di dunyayeke xweş de dijiyam. Ev cîhan cîhaneke ji dunyaya rastîn dûr û alemekî din bû." Ev guhertina ku ew dixwaze gelo tenê guhertina manewî ya giyanî ye yan guhertina madî civakî ye jî. Weke tê zanîn ew dem û niha jî di Îranê de sazûmanên kevnare, paşverû (berê Şah hebû û niha jî Ayetullahên olperest ên Şîa hene) Û her rewşenbîr dixwest ku ew sazûman bifelişe, têk here û were guhertin.

Di awayê vegotinê û şêweya ravekirina Sadiq Hîdayet de û di naveroka romanê ya hestên ruhî, derûnî û psîkolojîk de jî diyar dibe ku nivîskar gelek di bin bandore Dostoyevskî û Kafka de maye. Bandora wan herdu nivîskarên navdar xwe di nav rûpelên romanê de didine hîs kirin. Ji xwe kurteçîrokên Sadiq Hîdayet tam Kafkaest in. Lewma jî Ewropî jê re dibêjin Kafkayê Îranî.

Kundê kor li cem hinek kurdan wek bêyewm, nebaş tê dîtin. Ji hêla hin



■ **Qapa pirtûka (Romana Kafkayê Rojhilat KUNDÊ KOR a Sadiq Hîdayet)**

belê vê carê ez kurdiya wê dixwînim.
Pirtûka S. Hîdayet di nav van 45 salan de ji aliyê bi dehan weşanxaneyên tirkan ên curbecur ve hatiye wergerandin û weşandin. Pirtûk bi kurdî jî du car hatiye wergerandin û ji aliyê du weşanxaneyên cuda ve hatiye weşandinê.
Ji bo Kund hinek jî Bûm dibjin. Wergera Ku Edîb Polat wergerandiye navê wê ”Kundê Kor” e, a ku Muhsîn Ozdemîr wergerandiye navê wê ”Bûmê Kor” e. Wergera Muhsîn di sala 2014an de di nav weşanên ”Na” de li Îzmîrê hatiye weşandin. A Edîb di nav weşanên ”Kora” de di sala 1995an de li Stenbolê hatiye weşandin. Muhsîn Ozdemîr ew ji orîjînala wê, ango ji farisî wergerandiye. Helbet di wergerê de metoda herî baş a wergerê ji orîjînala wê wergerandine. Heger ji zimanek din jî were wergerandin divê orîjînala wê neyê xirabkirin an jî weke ku wergêrê bêcidiyet Kawa Nemir neke û li gorê xwe tê de tehrîfatan, guhertinan neke. guhertin çêkirin, tiştên ku di orîjînalê de tune be di dema wergerê de lêzêdekirin ne exlaqên wergêriyê

Romana Kafkayê Rojhilat "KUNDÊ KOR"a Sadiq Hîdayet

Lokman Polat*

"Romana Kundê Kor berhemeke surrealîst e. Vegotineke gunehkar ku tê de rastiya bi xewnan pûç bûye bi siya, deng û halusinasyonan ve girêdayî ye.

Min pirtûka Sadiq Hîdayet a bi nave "Kundê Kor" di sala 1977an de ku li tirkiyê hatibû wergerandin, min li Stenbolê kirî û xwend. Di navberê de 45 sal derbas bûye, vêca ez carek din dixwînim, lê

*Wêjevan û rexnegir e, di sala 1956'an de li navçeya Licê ya Amedê hatiye dunyayê. Ew çend caran hatiye girtin û deh sal û nîv ceza xwariye. Ji sala 1984'an de li Swêdê bi cih bû ye. Li Swêdê desţ bi nivîsandina çîrokan û romanan kirye. kovareke çandî, wêjeyî bi navê Helwesţ li Swêdê weşandiye, her wiha bi navê Ronî jî kovareke wêjeyî li Stenbolê weşandiye. Endamê Komeleya Nivîskarên Kurd û PENa Navneteweyî û Yekîtiya Nivîskarên Swêdê ye. Bi dehan pirtûkên wî derketine (roman, lêkolîn, kurteçîrok û nerxandin).

geş û xweş in ku mirov nikare salixê wan bi dev û pênûsê eşekere bike. Tenê eger mirov saline dirêj li ser wan lêkolîn bike, hingê mirov hinekî tê dighêje ku xeml û rewşa çîrokan çiqas zêde ye.
Di çîrokên Folklorî de tewr û awayên jiyana neteweyî cih girtine. Her wiha jiyana çînayetî û perwerdekirina mirovan jî tê de xweş eşkere ye. Di çîrokan de aliyên girantir zêde ev in: Balkêşî, fentezî, têkiliya kulturî, naskirina xwezayê, xweparastina li pêşberê belayan, xwenasîya nijadî, baweriya bi xwe, heskirina ji zimanê xwe û hwd...

-Weke hun dizanin ku di vê der barê de ragihandin roleke mezin dilîze. Gelo li gor şopandina we ragihandina kurdî bi gişti bi rola xwe di danasîna folklor, zargotin û kelepûra gelêrî de dilîze yan na û eger nalîze çima?

Medya û Ragihandina Kurdî, çendî ku dilqekî mezin didine leyztandin, lê mixabin ew berpirsyariya xwe bi cih naynin û neanîne jî. Ji ber ku radyo, televizyon, rojname, kovar û tiştên wisa tev yên rêxistinan in û ew li gor projeya ku berê danîne ber wan dilipikin.
Ya duyem, li Bakurê Kurdistanê zimanê ragîhandina Kurdî ji %90, bi tirkî ye. Li Rojavayê Kurdistanê piranî erebî ye. Li Rojhilatê Kurdistanê farisî ye.
Pêwist e û gelek jî girîng e ku ragihandina Kurdî, giraniya xwe bide ser Zimanê Kurdî, Tore û Folklora Kurdî.

-Projeyên we yên paşerojê çine? Yan jî niha hun ser çi dixebitin?

Projeyên min ên paşerojê, di 1984an de hatine eşkerekirin:
. Tîpguhanztina Klasîkên Kurdiya kurmancî ye. Heta niha 32-33 klasîk hatine weşandin.
. Berhevkirina berhemên Folklora Kurdî ya kurmancî ye.
. Amadekirina pirtûkên ji Çîrokên Folklora Kurdî ji bo zarokan e.

-Birêz Zeynelabidin Zinar, dubare em spasiya te dikin! Heger gotineke te ya dawî hebe, kerem bike.

Ez jî spas dikim ku we ev derfet daye min ku ez van gotinên xwe bigehînim hemwelatiyên xwe.
Gotina min a dawîn ev e: Îro li dinyayê bi sedan neteweyên cuda cuda hene. Lê ji aliyê reng û tîpê ve, tenê çar cûre (reş, zer, sor û spî) mirov hene. Dema ziman û tore ji nava meriv hatin hildan, meriv êdî ne çu tişt e.
Tiştê ku min û te bi hevûdu ve beste dike, Ziman û Toreya Kurdî ye.
Nifşên Kurd, bi taybetî zarok, niha di xetereke pir mezin de ne. Divê her dê û bav, bi zarokên xwe re bi kurdî bipeyivin û li gor Toreya Kurdî wan perwede bikin. Her wiha divê hemû Kurd, li her cihî bi hev re bi kurdî bipeyivin.
Yan na, 50 sal şûn de êdî kes bi Zimanê Kurdî napeyve.
Xwedayê mezin alîgir û piştevanê çanda Kurdî be.

Silav û rêz, her şad û bextewer bin…

bi dehan semîner û konferans bi eynî mebestê çêbûne. Jixwe gelek bernameyên televizyonî, xwerû li ser Ziman û Çanda Kurdî hatine weşandin. Xebata min berdewam e…

-Tevî hemû siyasetên qirkirin û tunekirinê yên ku li ser gelê kurd hatine û tênе meşandin jî, lê kelepûra gelêrî ya gelê kurd heta astekê hatiye parastin. Li gor we çawa xwe parstiye heta roja îroyîn?

Rast e, sqûmat û bobelatên pir mezin hatine serê Kurdan û bi taybetî jî hatine serê Ziman û Çanda Kurdî. Lê Neteweya Kurd xwe bi van sazî û xwezaya xwe ya çiyayî parastiye. Di radeya yekemîn de Medreseya Kurdî, Tekyaya Şêxan û dîwana mîr û beg û axeyên Kurdan, her wiha stranbêj û çîrokbêjên Kurd, ev çandê û ev zimanî parastine.

Ya duyemîn jî, Zimanê Kurdî pir dewlemend e, mînak: 24 navên sivnikê û deh navên serhişkiyê di kurdiya kurmancî de hene. Eger nîvê van peyvan herin jî, dîsa kurdî ji zimanê gelek neteweyan dewlemendtir e.

Ev e 19 sal in ku ez ferhengekê amade dikim. Heta niha min 80 hezar peyvên kurmancî berhev kirine. Bereketa Xwedê lê be, belkî ez karibin 80 hezar peyvên din jî bi dest bixim. Min 1.710 perçe Folklora Kurdî berhev kiriye. Ev xebata min, mîna ku meriv çengek av ji oqyanosê hilde, hindik e. Niha 370 çîrokên folklorî li ba min hene. Her yek ji wan dunyayeke serbixwe ye pirî ku dewlemend in…

Çîrokên Folklora Kurdî li ser gelek tewrên babetcihê hatine honandin û wisa

-Ta niha çend berhemên we derketine û gelo der barê zargotin û folklor de berhem an jî nivîsên we hene?

Min sal 1963-64 bi tîpên erebî dest bi nivîsandina Zimanê Kurdî kiriye. Lê piştî 1984an ku min weşanxane li Siwêdê ava kir, min bi rêkûpêk dest bi nivîsandina kurdî ya bi alfabeya Latênî kiriye.
Heta niha bi imzeya min 131 pirtûk hatine weşandin. 1.710 perçe wek sernav, berhemên Folklora kurdîya kurmancî di deh cild pirtûk bi navê XWENÇEyê de weşandin. Min tîpguhêziya 32 yan 33 berhemên klasîkên Kurmancî jî kiriye û wek pirtûk weşandine (www.pencinar.se). Lê eger Xweda lihev bîne, ez ê jimara pirtûkên xwe bigehînim 178an.

-Weke hun dizanin ziman jî mîraseyeke çandî ye. Gelo xebatên we yên der barê ziman û wêjeyê de kengê û çawa dest pê kir?

Ziman hem wek kes, hem jî wek netewe, rihê nijadî ye. Mîrateya herî rûmetdar û nirxdar, ziman e.
Çewa ku li jorê jî hatiye gotin, min di 1963-64an de dest bi nivîsandina Zimanê Kurdî kiriye. Lê piştî 1984an, bi rêkûpêk min karê xwe domandiye, bi sedan gotarên min ên li ser zimên hatine weşandin û

û milk. Lê wek netewe jî, welat e. Li dunyayê her kesî mîrata xwe ya kesayetî parastiye. Wek netewe jî bi navê Dewletê, her neteweyekê axa bav û kalên xwe bi sînorên kifşkirî xistiye binê çavdêriya xwe.

- Mîrateya Manewî: Hemû tiştên girêdayî bi jiyana meriv ve ne. Weke ziman, çand, tore û kelûpelên jiyanê.

Bêguman parastina Çanda nijadî, di binê desthelatiya dewletê de tê jiyandin û li her welatî ji aliyê saziyên perwedeyî ve têne domandin.

Mîrata Çandî di nava Kurdên Kurmanc de ev e: Gotinên Pêşiyan, Mamik, Lawik, Bacî, Heyranok, Kilam û Stiran, Meselok, Pêkenok, Lawij, Xweşbêje, Şîret, Serpêhatî, Çîrok û Çîrvanok.

Lê di nava Kurdên Herêma Soranê de jî, dîsa ev in û hemû kelûpelên girêdayî jiyanê ve, weke qaf û qurên nava malê, amûr û bûjenên kar û xebatê û hwd.

-Li gor we, rê û rêbazên parastina kelepûra çandî û kelepûra civakan çi ne?

Bersiva vê pirsê, sed rûpel nivîs jî têr nakin. Lê bi kurtî dikarim wiha bibêjim:

Li jorê hatiye gotin ku dewlet karê parastina çandî dike. Lê neteweyekî ku dewleta wî nebe, jê re rê û rêbazên parastina kelepûra çandî ev in:

. Divê dê û av bi zarokên xwe re hertim bi zimanê xwe bipeyivin.

. Toreya nijadî ji zarokan re bê gotin.

. Divê ji zarokan re çîrokên folklorî bêne gotin.

. Gotinên Pêşiyan û danasîna xwezaya welat were gotin.

. Parastina ji xirabiyan û kirina tiştên baş werin gotin.

. Zimanê bazar û bazirganiyê bibe zimanê nijadî û hwd.

-Birêz Zeynelabidin Zinar em bixêrhatina te dikin û te spas dikin ku te hinek ji dema xwe ji bo Şermola veqetand.

Ez jî spas dikim û ji we re, ji bo hemû karmend û birêveberên Kovara Şermolayê re serkeftin dixwazim.

-Destpêkê hema bi çend hevokan be jî xwe bi xwînerên Şermolayê bide nasîn.

Ez di 1953an de li Bakurê Kurdistanê, li gundê Hedhedka girêdayê bi navçeya Qubînê ve hatime dunyayê.
Pêşî min li cem bavê xwe Medreseya Kurdî xwendiye. Piştre ders ji gelek dersdarên hêja xasma weke Mele Sedredîn Yuksel, Mele Ebdurehman Nusra û Xelîfe Ûsiv wergirtine.
Piştî xwendina yazdeh salên Medreseyê, min Imam-Xetîba Amedê û lîseyeka tirkî xwendiye. Piştî kurtedemeke leşkeriyê, min yazdeh sal li Belediya Êlihê karê diravî kiriye.
Ji 12ê îlona 1980yî hetanî 1984an, ez heşt caran ji aliyê Cuntaya Leşkerî ve hatime girtin û 178 roj îşkence li min kirine. Piştre Dadgeha Leşkerî sizaya girtîgeh û sirgûnê daye min. Di dawiya 1984an de ez çûme Swêdê. Di sibata 1985an de li nexweşxaneya Xaça Sor beşa îşkencedîtan a Stockholmê hetanî 1995an tedawi bûme. Min li Swêdê weşanxane (Pencînar Weşanxaneya Çanda Kurdî) û çapxane avakirine. 2004 çapxane hate girtin, lê weşanxane berdewam e.

-Kelepûra çandî di parastina nasnameyên çandî û her wiha di hevgirtina civakî ya gelên cîhanê de xwedî roleke girîng e. Nêrîna we di vê derbarê de çiye?

Dema bavek dimire zarokên wî dibin mîratxurên wî û malên wî ji xwe re diparêzin. Her wiha ew zarok dibin mîratxurên ziman û çanda wî bavî jî.
Çewa ku Xwedayê mezin bi vê Ayetê gotiye:
((وَجَعَلْنَاكُمْ شُعُوباً وَقَبَائِلَ لِتَعَارَفُو (we ce´elna kum şu´ûben we qebailen li te´arefû/ me hun wek netewe û qebîle afirandiye da hun hevûdu binasin- Hucurat-13) û bi ayeteke din jî gotiye: (Her ziman û her çand, her yekê ayetek ji ayetên min in…) (Rûm/22) divê her kes û her netewe çanda xwe biparêze. Ji ber ku çand zagona jiyanê ye û ji bo ku meriv xwe biparêze, çi wek kes û çi jî wek netewe biparêze, pir girîng e ku meriv xwedî li çanda xwe derkeve.
Hemû neteweyên li dunyayê xwedî li çanda xwe derdikevin û zimanê xwe diparêzin. Bi wê yekê yekîtiya wan a neteweyî derdikeve holê. Divê em Kurd jî wê xwedîtiyê li çanda xwe bikin.

-Dema ku em behsa kelepûra çandî ya maddî û manewî ya gelan û civakan dikin, çawa û li ser çi bingehê peyva "kelepûr" tê bikaranîn? Ango mîrasa çandî ya gelêrî, çi digre nava xwe?

Wateya peyva "kelepûr"ê, pir fireh û bê sînor e. Lê ger bi kurtî bibêjim, ev e: Ji bo her kesî û ji bo her neteweyê, du mîrateyên girîng hene: Mîrateya Madî û Mîrateya Manewî.
-Mîrateya Madî/pêgir: Weke ax, av, xanî

Hevpeyvîna Hejmarê

Nivîskar Zeynelabidin Zinar ji ''Şermola'' re:

"Divê her kes û her netewe çanda xwe biparêze. Ji ber ku çand zagona jiyanê ye..

Hevpeyvîner: Aram Hesen

"Tîra ku ji 'acê ber hedef bû
Amac bi sefweta sedef bû

Amac ku bû me'hellê peykan
Durrdane bedel kirin bi mercan

Nebl hateve nesl ma di wê da
Nesla xu ji can û dil bi wê da..."

- Wêje, di heman demê de hêz, rengînî, zengînî û ahenga wî zimanî jî diyar dike. Lewre zimanê xurt herî zêde di wêjeyê de xwe dide der. Ehmedê Xanî jî bi taybetî xweştiye hêza zimanê kurdî nîşanî cîhanê bide. Her wiha xweştiye ji cîhanê re ragihîne ku gelê Kurd xwediyê dîrokeke kevnar, çandeke dewlemend û zimanekî rengîn û zengîn in. Rewşenbîr û wêjevanên wan jî ne kêmî yên cîhanê ne. Ku di pirtûka xwe Mem û Zînê de wiha dibêje:

"Înaye nîzam û intîzamê
Kêşaye cefa ji boyî amê

Da xelq nebêjitin ku Ekrad
Bîmerîfet in bi esil û buniyad

Enwaê milel xudankitêb in
Kurmanc tenê di bêhisêb in

Hem ehlê nezer nebên ku Kurmanc
Işqî nekirin ji bo xu amanc

Têk da ne talib in ne metlûb
Vêkra ne mûhib in ew ne mehbûb

Bîbehre ne ew ji eşqbazî
Farx ji heqîqî û mecazî

Kurmanc ne pir di bêkemal in
Emma di yetîm û bêmecal in

Filcumle ne cahil û nezan in
Belkî di sefîl û bêxudan in..."

Ehmedê Xanî her wiha ferhenga erebî-kurdî ya bi navê **'Nûbihara Piçûkan'** jî bi helbeştkî honaye. Texmîn nakim li ti welatan ferheng bi helbeştî hatibe nivîsîn. Piştî xwendina Quranê li medreseyên Kurdistanê berî her tiştî ev ferheng dihat xwendin û jiberkirin.

Dema mirov van egeran tevan berhev dike, baştir diyar dibe ka Ehmedê Xanî ji bo çi armanca xwe, derd û kulên xwe û hêviyên xwe bi wêjeyê rave kirine. Xanî her wiha egera nivîsa Mem û Zînê jî wiha vedibêje:

"Zuhre bibihêt newayê 'uşşaq
Reqqas bibit li ewcê neh taq

Saza dilê kul bi zîr û bem bit
Sazendeyê 'eşqê Zîn û Mem bit

Şer'ha xemê dil bikim fesane
Zînê û Memê bikim behane

Nexme we ji perdeyê derînim
Zînê û Memê ji nû vejînim..."

bi rêbaza helbestê ne. Avesta, Tewrat, Zebûr, Incîl û Quran di aliyê wêjeyê de yek ji ya din dewlemendtir e. Bi taybetî dema Quran

bi tecwîd tê xwendin, ku ew jî beşeke hunerê ye, heskirina guhdarîkirina wê sed qatî pirtir dibe.

Wekî din li Kurdistanê berê li malan, li koçik û dîwanxaneyan şevên Çile û Kanûnan bi hefteyan bendên çîroka Rûstemê Zal, Feyrûşah û çîrokên din dihatin gotin. Û her kes bi kelecan li bendê dima ku êvara din biçe guhdarî bike. Jixwe di nava civakê de çîrokbêjên taybet hebûn û pir rêz ji wan re dihat girtin. Lê tam û çêja stiranan pir cuda bû. Lewre di stiranan de hem dîrok hebû, hem huner, hem dengê xweş. Û stiranan ji bandora xwe tiştek kêm nekiriye, tersê wê beşeke girîng ya jiyanê ye. Dema Mihemed Arifê Cizîrî dibêje, **"Xezal Xezal"**, yan **"Eyşana Elî'**, kîjan dil dikare xwe bigire û bi ser piyan nekeve? Dema Îbrahîm Hesen dibêje **'Wey Xeco'**, ma kîjan dil nakeve lerzê? Dema Eyşe Şan stirana **"Qederê"** dibêje kîjan dil hestiyar nabe?

- Mirov ji dubarekirina xwendin û guhdarîkirina wêjeyê, (bi taybetî helbestan) naazire. Bi salan û bi sedê caran mirov dikare guhdarî heman stiranê yan heman helbestê bike. Pirtûka **"Çîrokên Hezar û Şevekê'** ku ji 12 bergan pêk tê û bi awayekî behsa dîroka Rojhilata Navî dike, eger ne ji ber huner û wêjeya wê ya xweş û bedew bûya wê ti kesî bi xwe re nedîta 12 bergên dîrokê bixwîne. Lê ji ber ku wêje ye mirov naxwaze ji destê xwe dayne. Bi navê **'Ramses'** (Firewnê Misrê) 4 berg behsa dîroka Misrê dikin. Ji ber ku bi rêbaza romanê hatiye nivîsîn mirov naxwaze dev jê berde. Herwisa Bonapart Napolyon û Iskenderê Mekdonî jî wisa ne. Ji ber ku bi hunera wêjeyê hatine ristin mirov naxwaze biqedin.

- Di nava kesên herî zêde welatên xwe bi cîhanê didin naskirin de wêjevan û helbestvan in. Li Fransa piştî weşana romana Dan Brown ya bi nav **"Şifreya Davîncî"** -ku bûyer bi giranî di dêrekê de diqewime- di nava hefteyekê de 5 milyon geştiyarî serdana wê dêrê kir. Eger ne bi xêra wê romanê bûya ti kesî serdana wê dêrê nedikir. Lewre ti taybetiyên wê nînin, ew jî dêrek weke her dêrê ye.

- Wêje carnan gencîneyên veşartî derdixe, carna jê tiştên pir nayên naskirin jî biqîmet dike. Heta li deverên weke Rûsya wêje bûye bingehê şoreşê jî. Jixwe sedema sereke ku desthilatên zordest li hemberî wêjevanan bihêrs in ev taybetî û bandora wan e. Ji ber wê li gelek welatan gelek wêjevan û helbestvan jiyana wan yan di girtîgehan, yan di koçberiyê, yan di binê gefên desthilatdaran de derbas bûye.

- Di wêjeyê de mijara têkiliya zayendî, ji ber ku bi hunerê tê xemilandin û bi zimanekî bedew û biaheng û ne yekser tê rêstin, di her civatê de dikare xwe bide guhdarîkirin. Çawa ku Xanî di Mem û Zînê de ji bo şeva zefafê ya Tacdîn û Sitî ev mijar wiha ristiye:

■ **Mem û Zîn- Ehemedê Xanî**

Yan şubhetê qelbê me yî
Ji 'işqa kê natebitê...”

çiqas dilê mirovan honik dike û xeyalên mirovan dixe nava lêgerîna avabûna gerdûnê û hebûnên din. Ev rêbaza Feqî ya axaftina bi xwezayê re, herwisa ji wêjevanên nû re deriyê xeyalên pir kûr vekiriye û ji bo wêjevaniyeke bibandor bûye çavkaniyeke pir xurt. Ji civaka Kurd gelek kes bawer dikin ku Feqî bi teyran re axiviye û ew jî pê re axivîne. Jixwe ji ber vê taybetiya wî navî wî bûye Feqiyê Teyran.

Siyahpoş jî ji bo evîna rast çi xweş gotiye:

“Ey hebîba! Ger cehennem da vebit tu dane bî
Bi qesem dê biçme nav da ez bi qesda daneyê...”

Şêx Şemsedînê Exlatî jî ku dibêje;

“Kunde tibêjit qû qû hudhud xwe tibêjit pû pû
Ez her tibêjim hû hû hey hey Çelebî qum qum

Hêstir ku tiçin şet şet sakin netibin qet qet
Seyran dikinê bet bet hey hey Çelebî qum qum...”

çiqas biaheng ristiye û bala mirovan dikişîne ser bedewiya wê. Wisa dike ku kesê bi qonaxan ji wêjeyê dûr jî zendûbendên xwe bipêçe û dest bi nivîsa helbestan bike.

Li aliyê din, olan jî girîngiyeke pir mezin daye wêjeyê. Dema mirov li pirtûkên pîroz dinêre, bi wêjeyeke pir xurt hatine ristin û li gelek deveren jî

hiş û kedeke pir mezin de derdikeve meydanê.

- Li aliyê din; -çi erênî çi neyînî- di jiyanê de tiştek qandî gotinê bandorê li mirovan nake. Çawa ku di biwêjekê de jî tê gotin; **"Namirim bi tîra pê re dimirim bi gotina wê re."** Ango birîna bi gotinan ji ya bi tîran xedartir e. Yan jî **"Gotina xweş xweş e, ya ne xweş kula reş e."** Herwiha weke biwêja; **"Bi gotina xweş mar ji kunê derdikeve."** Ku wêje jî gotinên neqandî û parzûnkirî ne.

- Gelek kes jî dibêjin, bandora wêjeyê bi qasî ya sihrê heye. Heta bi sihrê pênase dikin, ku mebest hêz û bandora wê ye. Ji pêşengên wêjeya kurmancî ya klasîk Melayê Cizîrî jî di helbesteke xwe de wiha dibêje:

"Di i'cazê beyanê da suxen ger bête insafê
Dizanit muxteser her kes Melê sihre îbaret kir"

"Eger di biwarê diyarkirina mû'cîzeyan de bi wijdan bê axaftin, bi kurt û cewher her kes dizane ku ev gotin û helbestên biefsûn Melê ristine." Mela di vê malikê de hêza helbestê weke hêza mû'cîzeyan dibîne û dibêje, ez bi helbestên xwe mirovan efsûn dikim. Di Hedîsekê de jî (gotinên pêxemberê islamê Mûhemmed) wiha derbas dibe: **"Bêguman di wêjeyê de sihir heye."**

- Wêje ji dergûşê heta gorê beşeke herî girîng e di jiyana mirovan a manewî de. Çawa ku qonaxa pitiktiyê bi lorîkên dayîkan derbas dibû, jiyana zaroktiyê jî bi mamik, çîrok, çîvanok û sirûdan dagirtî bû. Çîroka **"Şengê û Pengê"** hê di guhê me de li zengil dixe. Gelek mamikên di zaroktiyê de me ji hev re gotîn hê li bîra me ne. Em niha jî xweziya xwe, avajiya xwe bi wan kêliyan tînin.

- Ji ber ku di wêjeyê de huner, (bi taybetî di helbestê de) aheng û melodî hene, hem li guh xweş tên, hem zûtir bandorê dikin, hem bandora wan mayînde ye. Helbesta

Perto Begê Hekarî ku li ser evînê dibêje;

"Min ji ewwel qet nezanî agirek sûzan e 'işq
Ateş û pêt û şerar e agir û nîran e 'işq

Gîr û Tersa û Yehûd e kafir e ateşperest
Hem Mecûs e hem wesen bêdîn û bêîman e 'işq...'

çiqas li guh xweş tê û wateya wê bandorê li kûrayiya hundirê mirovan dike. Her wisa helbesta Feqiyê Teyran ku dibêje;

"Ey av û av ey av û av
Ma tu bi 'işq û muhbetê
Mewc û pêlan tavêy belav
Bê sekne û bê rahetê

Bê rahet û bê sekne yî
Yan 'aşiqê baxwê xwe yî?

"Ez Xelef im Xelef im hawar e Mîr hawar e Mîr
Xwediyê şûrê sedef im Êzdîn Şêr begê Bohtan e

Ez Xelefê kinik im hawar e Mîr hawar e Mîr
Xwediyê şûrê şirik im Êzdîn Şêr begê Bohtan e..."

tê gotin dîrok û serhildanên Kurdan yek bi yek di ber çavên mirov re derbas dibin.

Dîroka wêjeyê û girîngiya wê:

Zanista ku berhemên neteweyekê yên bi gotin û nivîskî yên bi hezarê salan afirandîn û nivîskarên wan berheman, bi rêbazeke zanistî li gorî herikîna dîrokê lêkolîn dike, jê re tê gotin dîroka wêjeyê. Dîroka wêjeyê cewher û naveroka hizrê neteweyekê yê dema borî, têgihîştin û nêrîna wê ya li gerdûnê, her wisa çand û şaristaniya wê digihîne nifşên nû. Bi wî awayî di navbera nifşan de pirê ava dike û dibe alîkar ku nifşên nû tiştên rast, bedew û baştir bibînin.

Armanca wêjeyê:

Armanca berhemên wêjeyê bi taybetî û yekser ne dayîna zanyariyê ye, bi awir û nêrîneke hunerî govanî û şahidiya bûyer an hebûnekê dikin.

Xanî çima wêje û di wêjeyê de jî helbest neqandiye?

Bêguman Xanî dikarî armanc û mebestên xwe, kul û kovanên xwe, dax û birînên xwe, êş û azarên xwe, keder û keserên xwe, elem û kelemên neteweya xwe, hest û helwesta xwe, filozofî û zanista xwe, bîr û baweriya xwe û hêza hunera xwe bi rêbazên din jî -weke roman, pirtûkên zanistê, pirtûkên dîrokê- bîne ziman. Heta vegotina bîr û hizran bi rêya roman û pirtûkên din ji helbestê hêsantir e jî. Lewre helbest hunereke wisa ye ku divê helbestvan hem di warê gencîneya peyvan de pir dewlemend be, hem di warê rê, rêbaz û pîvanên helbestê, hem di warê ristina peyvan û ahenga di nava wan de pispor be. Her wisa divê bi qasî bedewî û lihevhatina ristan wate jî xurt be. Lewre ji helbestê çiqas awazeke xweş û biaheng derkeve jî eger wate lewaz be ew helbest nagihe armanca xwe. Baş e wê demê Xanî çima di rêwîtiya xwe ya hizir û hişmendiyê de ne nişûv evraz neqandiye? Sedema neqandina rêya zehemet çi ye?

Ev pirs hizra mirov dibin ser hêz, raz û tilisma wêjeyê. Çima wêje? Di wêjeyê de çi heye? Mirov dikare çend egerên berbiçav yên neqandina wêjeyê bibîne.

- Berî her tiştî, çawa ku di pênaseya têgîna wêjeyê de jî derbas dibe, wêje li ber ronahiya finda serî, di encama hizirîneke pir kûr, yekkirina

■ Ehmedê Xanî

"Şem'ê ser nûr nadirit ger ew nekî perhîzê dil
Zewqê cama 'işqê nakit ger nekit imsakî ruh"

Bandora wêjeyê:

Wêje, bi tevayiya beşên xwe ve -çi devkî çi nivîskî- bandoreke wisa mayînde li mirovan dike ku heta sax in ji bîr nakin. Mirovan ber bi xeyalên kûr ve dibe û kêliyên pir xweş û hestiyar bi wan dide derbaskirin. Balkêş e ku ne di xweşî û şahiyan tenê de, di mijara şîn, girî û miriyan de jî ya herî bibandor wêje ye. Mirov miriyên xwe jî bi wêjeyê vedişêrin. Şer, ceng û mêrxasî jî bi wêjeyê hatine vegotin. Dema dengbêj Kazo dibêje;

"Hey xan e xan e xan e ser
Dimdimê dûman e.
Şerê şahê Eceman wê li ser xanê
Kurdan e..."

kelecaneke germ mirovan digire û hestên kurdayetiyê bi ser piyan dikevin. Her wisa dema;

wêje bû, min xwest egerên neqandina Ehmedê Xanî ya wêjeyê binirxînim.

Berî ku behsa Ehmedê Xanî û girîngiya dayî wêjeyê bikim, bi çend gotinan be jî dixwazim wêjeyê û armanca wê reşbelek bikim. Lewre bê ku em his bikin, wêje di jiyana me de ciyekî pir girîng digire û bandorê li jiyana me ya rojane dike.

Wêje:

Wêje, hunera vegotina bi rêya gotin û nivîsê ya hizir, hest, bûyer û xeyalên wisa ye ku di mirovan de hestên bedew şiyar dike.

Li rex vê pênaseya ferhengî mirov dikare li gorî bejin û bala wêjeyê, li gorî hêz, bandor û cewherê wê û li gorî bedewî û delaliya wê, pênaseyeke wiha jî jê re bihone: Wêje, xemil û xêza peyvê ye; cewherê gotinê ye; hinek caran peyameke sergirtî ye û tijî raz e. Çawa ku Xanî der barê raza cezakirina Iblîs de wiha dibêje:

"Iblîsê feqîrê bî cînayet
Hindî te hebû di gel 'inayet

Her rojê dikir hezar ta'et
Lewra ku te da wî istita'et

Wî secde nekir li xeyrî me'bûd
Gêra te ji ber derê xwe merdûd

Yek secde nebir li pêşî exyar
Qehra te kire mûxelledennar..."

Wêje, guhê guhdar dike çar û dilan germ dike. Weke zêrê helandî ye û ji heyberên biyanî hatiye paqijkirin; her wisa pend û şîret in. Çawa ku Xanî der barê evînê de dibêje;

"Yarî ne hêsa ye cefa ye
Meqsûd ji yariyê wefa ye

Eger tuwê nekî wefayê
Ewwel nede ber xwe cefayê..."

Wêje, di dereceya herî jor de axaftinê şîrîn û rewşê zelal dike. Ti gotin cihê wêjeyê bi taybetî biwêj û helbestê nagirin. Hin biwêj yan helbestên wisa hene, li şûna wan ku tu pirtûkekê jî binivîsî, dîsa cihê wan danagire, wê wateyê nade û bi qasî wan bandorê nake. Dema ji bo kesê xizan biwêja **"Tu tayekî ji kirasê wî bikişînî wê sed reqepîne jê bikevin"**, yan dema ji bo kesê xemsar biwêja, **"Tofan rabe av nade çoka wî"** û ji bo kesê li belayê digere biwêja **"Lingê xwe li guhê xwe dixe"**, tên gotin, rewşa wan mirovan weke neynikê tê ber çavê mirov. Xanî di vê malikê de;

"Mem bo min û mer'hemet ji bo te
Xem bo min û seltenet ji bo te..."

Evîna Zînê ya ji bo Mem çi xweş ristiye. Herwisa kîjan gotin dikarin ciyê vê helbesta Melayê Cizîrî ya derbarê perwerdekirina dil û ruh de bigirin?

Ehmedê Xanî û Wêje

Diyar Bohtî*

> **Ehmedê Xanî xwestiye ji cîhanê re ragihîne ku gelê Kurd xwediyê dîrokeke kevnar, çandeke dewlemend û zimanekî rengîn û zengîn e.**

Nêzî du salan e di her jimara kovarê de xelek bi xelek li ser Mem û Zîna Ehemedê Xanî dinivîsim. Di jimarên borî de bi sernavê **"Xanî û Destthilatdarî, Xanî û Rêveberî, Xanî û Welatperwerî û Xanî û Dewlet"** şîroveyên li ser Mem û Zîn'ê hatine weşendin. Ji ber ku rojeva vê jimarê

*Nivîskar û rojnamevan, sala 1958an li herêma Bohta ya bakurê Kurdistanê hatiye dinyayê. Bi giştî ev 20 sal in li ser hev di karê ragihandin û çapemeniyê de dixebite. Herwiha di ber karê xwe re xebata ziman û wêjeya kurdî jî dike. Çend pirtûkên wî (roman, helbest, biwêj) hetine çapkirin.

nava civaka kurde xwedî cihekî giring e. Wêjeya devkî û piştî wê jî wêjeya nivîskî, di hemû çalakiyên civakî yên mîna, şahî, şîn, şer, serkeftin û çîrokên heskirinê û destanên lehengiyê cihê xwe digrin.

Li Rojava; beriya şoreşê gelek astengî û zehmetî hebûn û mirov nedikarî bi zimanê xwe bixwîne û binvîsîne, ji ber ku serbestî û azadî di vî warî de tune bû. Ji bo awaz, nivîs û axaftina bi kurdî gelek kes dihatin binçavkirin û kuştin. Lê di dema îro de bi hezaran pirtûkên kurdî hatine çapkirin. Dibistan û zanîngehên kurdî vebûne û mirov dikare bi rengekî azad bê tirs û xof ziman û çanda xwe bijî û bi rengekî azad bilêv bike, ji bo pêşxistina wê jî kar û xebatê bide meşandin. Lê weke ku em dizanin hêzên kapîtalîst û dagirker bê navber êrîşî çand û kelepûra kurdî dikin û pişaftin û qirkirineke çandî û axlaqî li ser gel û civaka kurd didine meşandin. Ji ber vê yekê bi rêbazên şerê teybet û derûnî di serî de li ser jin û ciwanan didine meşandin. Li beramberî vê yekê gelek dikevin bin bandora vî şerî de û roj bi roj ji rastî, dîrok û çanda xwe dûr dikevin û dikevin bin bandora çandên din de.

Erkê her rewşenbîr û nivîskarekî kurd ew e ku xwedî li çand û kelepûra xwe derbikeve. Di vî warî de lêkolînan pêş bixe, dîrok û şehristaniya ku bi rêya awaz, çîrokên kevin û kilasîkên kurdî hatine vegotin zindî bihêle, biparêze û pêş bêxe. Kevneşopiya kurdî ya ku mîna kombûna irf, adetên olî, civakî yên ku civak û kombûn pê tê naskirin û ev kelepûr ji nifşekî derbasî nifşekî din dibe ew dibe nasnameya wê civakê û wî gelî. Her wiha erkê civakê û her kesekî ku dibêje ez kurd im û di damarê wî de xwîna kurdî digere pêwîst e ku xwedî li hebûn, çand û dîroka xwe der bikeve û biparêze.

Gelek rewşenbîr û nivîskar ji bo parastina kelepûra xwe ked û xebatê didine meşandin û xwdî li ziman û hebûna xwe derdikevin û ji bo vê yekê jî dîl hatine girtin û hatine işkencekirin û kuştin. Lê ji milekî din ve jî hin rewşenbîr û nivîskar hene ku tu ked û xebata wan ji bo kelepûra kurdî li holê xuya nake, tenê bi nav kurd in û çand û kelepûra xwe ji bîr kirine. Bi berdewamiya şoreşa Rojava re vejîneke çandî û wêjeyî bi rengekî giştî pêk hatiye û ji hemû milan ve li ser vê yekê tê rawestandin. Her hunermend, nivîskar û rewşenbîrekî ku dibêje ez kurd im û bi raman û pênûsa xwe, xwedî li gel, ziman, dîrok û kelepûra xwe dernakeve û di vî warî de tu xebateke wî ya ber bi çav li holê nîne, mirov nikare jêre bibêje rewşenbîr.

Navdarên kurd ên ku kelepûra kurdî parastine em minetdarên wan e û pêwîst e ku em rêya wan bişopînin, wêje û kelepûra devkî derbasî nivîsandinê bikin, pêşxistin û parastina wê bikin. Dema ku em xwedî li ziman, wêje û kelepûra xwe derkevin, tê wateya ku em xwedî li şehîd, dîrok, nasname û welatê xwe derdikevin.

helbest, raman û nivîsên xwe kelepûr û kevneşopiya kurdî heyanî roja îro anîne û parastine. Rewşenbîrê ku xwe mîna pêşeng û nûnerê gel dibîne, pêwîst e ku girêdayî kelepûra xwe ya resen be û wê biparêze. Ji milekî din ve jî pêwîst e ku rewşenbîr û nivîskar nefes bi nefes ji bo parastin û pêşxistina çand, wêje û kelepûra kurdî bixebitin.

Helbestvanên mîna Xanî, Cizîrî, Feqê Teyran, Cegerxwîn, Tîrêj û Osman Sebrî û bi dehan helbestvan û nivîskarên din kedeke wan a ber bi çav di pêşxistina ziman, edebiyat û kevneşopiya kurdî de heye. Ji beriya ku rewşenbîr û nivîskar binvîse pêwîst e ku bixwîne û dîrok, şaristanî ziman û çanda xwe baş nas bike. Ji ber ku bi tena xwe hest têra wêjeyê nake, lê dema ku hest bi dîrok, rastiya civakê û kelepûra wê ve bibe yek wê demê hîn bêtir cihê xwe digre. Pêwîst e ku rewşenbîr, nivîskar û hunermendên kurd xwe dûrî bandora çand û zimanên biyanî bikin û rastiya dijminê xwe nas bikin û her tim li hemberî şerê taybet ê ku li ser gel û civakê tê meşandin tekoşînê bikin. Ji bo parastin û pêşxistina kelepûra kurdî jina kurd jî xwedî cihekî sereke û bingehîn e û mirov dikare bibêje ku jina kurd kelepûra kurdî û civaka kurd heyanî îro parastiye û bi saya wê îro xwe li ser piyan digre û li ber xwe dide. Nivîskar, hunermend û rewşenbîr, ji bona gel û civaka xwe di warê zanist, dîrok, felsefe, parastina kevneşopî û kelepûra kurdî de pêşeng e û her tim berê gelê xwe dide jiyana azad û bi rûmet. Erkê nivîskar, rewşenbîr û hunermendan ew e ku mîna pirekî remanê xwe ji bo civakê û zindîhiştina kelepûr û dîroka kurdî û ji nifşekî gihandine nifşekî din. Dezgehên ragihandinê jî di parastin û pêşxistina kevneşopiya kurdî de xwedî cihekî taybet in, ew mîna pencereya ku hemû xebatên hunerî, çandî û wêjeyî bi rêya wê vegotina xwe tîne ser ziman û xêz dike. Dema ku em behsa kelepûra kurdî dikin, di serî de cil û bergên kurdî jî cihekî xwe yê giring di parastina kelepûra kurdî de digre, ji ber ku parastina kelepûra kurdî bi rêya parastina cil û bergên kurdî pêş dikeve û bi rêya wê jî kurd xwe ji derdoran re didine nasîn û cîhan jî li gorî vê yekê wan û nasnameya wan nas dikin. Dema ku em behsa kelepûra kurdî yan jî kevneşopiya kurdî dikin, wê demê yekser folklor, awaz, helbest, çîrok, metelokên kurdî têne bîra me. Her wiha destan, şano, hunera gelerî, irf û adetên civakî, cejnên neteweyî, şahî û şîn têne bîra mirov. Gelê Kurd bi kelepûra xwe, xwe li ser piyan girtiye û tekoşîna ku di vî warî de dide meşandin cihê şanazî û serbilindiyê ye.

Sitranên destanewî di nava civaka kurd de xwedî cihekî giring in û hemû rexên jiyanê bi awazan tên bilêvkirin, di serî de awazên lehengiyê, yên palahiyê û yên şivantiyê û yên şahî û şînê jî bi serê xwe her yekî ji van di

pêşketina ziman, asta pêşketina jiyanê raber dike. Ji milekî din ve jî bi qasî ku civakek zimanê xwe wenda kiribe û bikeve di bin bandora zimanên din de, wê demê ew yekser dibe mêtîngeh û rastî pişaftin û qirkirinê tê û hebûna xwe ya zihnî, sincî û xweşikbûnê wenda dike. Di rewşeke wisa de û di serî de mîna civaka kurd wê rewşeke bê çare û lawaz ji milê abûrî ve bijî û wê tu caran nikaribe xwe ji binkeftin, şaşîtî û îxanetê xilas bike. Çand û ziman şoreşa xweşikbûn û sinca civakê ne. Her wiha bingehê kelepûra kurdî, paşeroj, pêşeroj û nasnameya wê ye.
kelepûra kurdî ya ku bi rengekî devkî hatiye heyanî roja îro piraniya xwe derbasî nivîsandinê nebûye, lê hunermendên kurd ji bo parastina kelepûra kurdî tekoşîneke bê navber didin meşandin. Ev yek jî bi rêya awaz, çîrok û metelokên ku bi devkî nifiş bi nifiş heyanî roja îro hatine tê xuyakirin. Lê ev kevneşopiya çandî ji milê gelek rewşenbîr û nivîskaran ve hatine paşguhkirin. Kelepûra kurdî di nava rûpelên xwe de çîrok, metelokên civakî, helbestên ku bi rengê destanan hatine vegotin, metelok, pend, şîret û destanan dihewîne. Ev yek jî tabloyeke zindî dide civaka kurd a kevnar û ya ku heyanî îro jî bandora xwe didomîne. Gelê kurd ji milê kelepûr, ziman û şaristaniya xwe ve û bi dirêjiya dîrokê ve ji milê hêzên mêtînger ve rastî pişaftin û qirkirina çandî tê. Armanca van hemû hêzan ew e ku nasname û çanda kurdî ji holê rakirin. şaristaniya gelê kurd bi rêya huner, çîrok, metelok û destanên dîrokî xwe li ser piyan girtî ye. Di dema îro de jî ev huner bûye stûn û deriyê wêjeya kurdî ji bo hemû kesên ku dixwazin ji kaniyan vî zimanî vexwin û jê sûdê werbigrin.
Bi dehan destanên ku ji bapîr û dapîrên me kurdan û bi rêya hunermendên ku bi rengekî lehengî ev çîrok û metelok anîne ser ziman û dîrokeke zindî ya ku nayê jibîrkirin bûye navnîşana şehristaniyê. Ji van jî mîna destana (Derwêşê Evdê – Siyamend û Xecê û bi dehan destanên din ên ku di bîr û hişê gelê kurd de mane.
Rêbazên parastina kelepûra kurdî pir in, ji van pirkirina navendên parastina mîrateyên kevnar û navendên xizmetguzariyê. Her wiha xebatên ji bo danasîna kelepûra gelê kurd a resen ji cîhanê re. Mîna erkekî bingehîn jî parastina dever û mîrateyên çandî û yên kevnar û rêgirtin li pêşiya wêrankirin û talankirina wan. Her wiha pêdivî pê heye ku civak di warê parastin û giringiya parastina mîrateyên kevnar de werin perwerdekirin û têgihiştina wan di vê astê de çêbibe. Avakirin, an jî peywendî bi saziyên ku elîkariyê didin û parastina van şûnwaran were kirin. Li gorî vê yekê tenê em dikarin bi rêya parastin û xwedî li kelepûra xwe derketin, li beramberî bandora kaptalîzmê ya ku nasnameya civakê dike xeteriyê de biseknin. Helbestvan û nivîskarên mîna Ahmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Feqê Teyran bi rêya

ku çand mîna asoyê danasîna civakê û bingehê wê yê destpêkê ye. Bê çand û civak negengaz e ku em behsa tiştekî din bikin, çand ji civakê re mîna av û masî yan jî mîna neynok û goşt bi hev ve girêdayî ye. Li gorî vê yekê çand kombûnên bi wate û binesaziyên ku civakê bi dirêjahiya dîroka mirovahiyê avakirine ye. Lê dema ku em behsa civakê dikin wê gavê mirov bi kurtasî dikare bibêje ku çand cîhana bi wate ya civakê û zagonên jiyanê, zihniyet, huner û zanebûna wê ye. Dema ku em weke saziyên siyasî, aborî û civakî bi vê wateyê re bînin cem hev. Bi wateya xwe ya giştî jî, ne gengaz e ku em li ser civakê biaxivin û weke hebûn bigrin dest, bê ku bingehekî wê yê sazîbûnê û wateyeke xwe ya cewherî hebe. Civakek bi tena serê xwe û bê ku peywendiyên xwe bi civakên din re hebe û bi tena serê xwe nikare bibe xwedî nasname. An jî ew civak nikare navekî li xwe bike û hebûneke xwe ya ber bi çav hebe. Tenê dema ku wê civakê xwe gihandibe asteke ji sazîbûn û wateya civakbûna xwe pêkanîbe, wê demê dibe xwedî nasname. Lê dema ku em behsa civaka bi sazî yan jî civaka bi wate ya bi tena serê xwe bikin û em bihizirin ku em ê bikaribin bi rengekî mirovane di nava wê civakê de bijîn. Wê gavê ev yek bi serê xwe şaşîtî û ji rêderketinek û lawaziyeke exleqî ye. Ev yek di hemû civakan de û bi dirêjahiya dîrokê hatiye jiyîn.

Her wiha ne gengaz e ku em li ser wateyê her çi civak be yan jî li ser çanda wê ya di çerçoveyeke teng de biaxivin piştî ku sazîbûna xwe wenda kiribe. Ji ber ku sazîbûn çandê komîserhev dike û bê rewşeke sazîbûnê, mirov nikare behsa çandeke bi wate û bandor bike. Xebata çandî ya ku di çerçoveyeke rêxistinî de xwe bi rêk û pêk tenzîm nekiribe, wê gavê ew çand wê bikeve di xizmeta kesên din de, an jî wê ji rêya xwe ya resen derkeve. Wê gavê mirov dikare bibêje ku civak wateya xwe ya hişmendî û xweşikbûna civakî wenda dike. Dema ku ev yek were jiyîn wê gavê tenê em dikarin behsa kombûneke ku cîhana xwe ya zihnî wenda kiriye û mîna gewdeyekî bê serî li holê hatibe hiştin dimîne. heger civak bikeve vê rewşê de wê demê weke laşekî ku bê parastin dimîne û bêhn pê dikeve û desteserkirina wê civakê hêsan dibe. Dema ku em civakekî bigrin dest, pêwîst e ku mirov wê civakê di çerçoveya hevgirtineke bi wate û li ser asta sazîbûnê bigre dest. Nimûneya vê yekê jî dema em civaka kurd bigrin dest, wê demê parçebûna rewşa sazîbûnm û zihnî ya ku tê de noq bûye, baş tê xuyakirin û bi navkirina civaka kurd, bi civaka ku rastî qirkirina çandî tê wê di cih de be. Ziman jî di heman demê de çand e. Ji ber ku ziman bi serê xwe kelepûr, hişmendî, sinc, xweşikbûn, hest û remanên ku civakê qezenckirine digre nava xwe. Civaka ku xwedî wate û hest be û karibe xwe bide naskirin wê demê ew civak gerekçeya bi hêz a jiyanê qezenc dike. Ji ber ku asta

Kelepûra Kurdî û Parastina wê

Erkê her rewşenbîr û nivîskarekî kurd ew e ku xwedî li çand û kelepûra xwe derbikeve.

Elî Roj*

Çand weke têgehekî dibe bingehê danasîna hemû têgehên din, ji ber ku di serî de çand tê û ger ku çand bi rengekî baş neyê şîrovekirin û naskirin, wê gavê naskirina hemû têgehên din wê bi rengekî hesanî pêkneyê. Ji ber

* Nivîskar û rojnamevan, di sala 1977an de li herêma dêrika hemko ji dayîk bûye. Di karê ragihandin de dixebite. Bi zimanê kurdî û Erebî dinvîse, Çend pirtûkên wî (helbeşt, bîranînan, jiyanên şehîdan) hetine çapkirin.

kurdan ser du para, ser du bendan tê parvekrin. Ser para pêşîn, ew pirtûk û witar têne hesabê, yê ku tene ji bo hînbûna zimanê kurdî hatine çapkirin. Lîtêratûra vê parêda nimûnêd zargotinê her tenê çawa matêryalê rûnkirinê (naskirinê) hatine kar anîn» Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, Zargotina Kurda I, Mosko, 1978, r.26-27.

Çîrok mînakeke baş e ji bona perwerdekirina zarok û nifşên ciwan. Her cureyeke ji van berheman bi bone yan çalakiyeke jiyanî ve tê girêdan. Jiyana rojane, rabûn û rûtiştin û kesayeta wan gelan nîşan didin :

«Edebiyeta welatî, ew edebiyata ku jîna miletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên wî, ji stran û lajeyên wî hil têt. Kaniya wê, dilê milet, his û heyata wî ye. Tenê ev edebiyat e ku germ rengîn, bibêhn û xwedan ronahî ye. Ji vê edebiyatê, dengê bilûr û dîlanê, stranên çiya, zîziya êvîn û hejkirinê bi teptepa dilan ve tên bihîstin». Kamîran Bedirxan, «Edebiyata Welatî», Hawar, j.1., Şam, 1932, r.5

Ji aliyekî ve, berhemên zargotinê amûrine bingehîn di avakirina hişmendiya nasnameyî û hevgirtina civakî de. Bi rêya vê kelepûrê nirxên îdolojîk ên her miletekî tên veguhestin weke nerînên wan ji pirsgirêkên gerdûnî re, pergala ramyarî, bawerî, kod û modêlên liv û tevgerê didin xuya kirin. Ji aliyekî din ve, ev berhem cihê kombûyîna bîra hevpar e, di heman demê zanîn û tecrûbeyên civakê baştir nîşan didin. Ji bona ji nêz ve naskirina rastiya miletekî, herwiha baş têgihiştina çand û exlaqên wan, zargotin weke zemîneke dewlemend e.

Berî nivîsê gotin û bêje hebûn, piştî ku nivîs derket tê gotin ku wê şûna gotinê girt, gelo çiqas rastiya vê angaştê heye? Hêjayî gotinê ye ku bi armanca parastina wan bi hezaran metin û tekstên zargotina kurdî hatine berhevkirin û çapkirin. Hinek xebatên zanistî hêja jî der barê wan de hene, lê gelo têrê dike? Ew berhemên ku sêwî di pirtûkxaneyan de mane, lewra ji bo qada lêkolînên zanistî warekî girîng û beyar e dema bê ajotin wê encamên balkêş bi xwe re derxîne, lê belê divê bi dûrbîna teyorî û rêbazên nûjen ên zanistî ku hatine pêşxistin lê were temaşe kirin û ronî kirin.

Çavkaniyên sereke:

-HESEN Bîlal, Ji Wêjeya Gel, Pend û Peng, 2008.

-CAUVIN Jean, Comprendre la parole traditionnelle « Têghiştina bêjeya kevneşopî », édition Saint-Paul, 1980

-BEDIRXAN Kamîran, « Edebiyata Welatî », Hawar, j.1., Şam, 1932, r.5

-CALVET Louis-Jean, La tradition orale, « Kevneşopiya devkî » Que sais-je, PUF, Paris, 1984

-CELÎL Ordîxanê û CELÎL Celîlê, Zargotina Kurda I, Mosko, 1978, r.26

-BAUMGARDT Ursula, DERIVE Jean, Wêjeya Devkî a Afrîkayê, Perspektîf û Rêbazên Teyorîk, Paris.2008.

-Ensîklopêdiya wêjeyî ya zimanên afrîkî ELLAF ji bo lêkolîn, belgekirin û weşanê.

-http://ellaf.huma-num.fr/

-Malpera UNESCO

-https://ich.unesco.org/fr/listes

wateya ez heme''. Nasandina peyvê li gorî hin êlên din jî bi vî rengî ye: di berhemdayîna bêjeyê de gelek hidamên "organên" mirov beşdar dibin " mêjî, kezeb, dil, qirik", hin civak jî hene pêvajoya pêkhatina peyvê şîrove dikin: di vê der barê de pispora wêjeya devkî a Afrîka yê G.Calam-Griaule li ser şêweya çêbûna peyvê li cem êla Dogon wisa nivîsandiye: "Peyv ji çar hêmanên bingehîn pêk tê: Av, ba, agir, ax, û piştre zeytê jî tevlî dikin". Civaka Yoruba jî peyvê wisa didin nasîn:" peyv mîna hêkekê tê dest nîşan kirin, ew di hundirê xwe de dewlemend e û dikare weke hêkekê bişke, di awayê xwe de divê peyv ne kêm be û bi ber be. Weke çawa bi şikestina hêkê re şopên ku ne hêsan in mirov ji holê rake, bi heman rengî jî gotin li pey xwe nîşanên kûr û encamên giran dihêle." Ursula Baumgardt, Jean Derive, Wêjeya Devkî a Afrîkayê, Perspektîf û Rêbazên Teyorîk, Paris.2008.

b. şêwaza hûnandin û vegotinê:

Metin û berhemên devkî yên ku ji aliyê pêşiyên me ve hatine vegotin, heya dema me zindî mane, hemû jî bi devkî û bi şêwazeke jiberkirinê hatine veguhestin. Helbet ev dînamîka han xwe dispêra avahîsazî (structure) û stîla wan metinan da ku bi hêsanî werin guhdar kirin. Teşe, rîtm, dûbarekirin, bikaranîna wêneyan, beşdarbûna herdu aliyên pêrformansê (gotbêj, guhdarvan) û hebûna çand û zimanekî hevpar di nava wan de, taybetmendiyeke orîjîl a metinên devkî ne.

c. Rêgez û pirnsîpên civakî (Norm):

Pend û şîret, çîrok, destan û her wekî din, berhemên ku nava wan her gotinek bi wate ye, ango awayê hûnandina bêjeyê ne asayî ye, bi mebest û aramanc in û ji axaftinên asayî yên rojane cuda ne. Ew berhem xêz û rêgezên gîştî yên civakekê diyar dikin. Gotinên pêşiyan di encama rûdana bûyerekê de derketine holê, temî, gazindekê, fermanekê nîşandidin. Sinc, exlaq û kirinên baş û yên ne baş jî bi çîrokekê tên şîrove kirin. Dengbêj weke tûrikê gotinan ne, xwedî wê statû û hostetiyê ne ku dema destanekê vedibêjin milet hişyar dikin, agahdar dikin, wan vexwînin ku dersan û aqilan ji tecrûbeyên dîrokî werbigrin.

III. Peywir û karîgeriyên zargotinê:

Bêguman, afirandin û vegotina berhemên devkî di nava civakê de, ne tenê bi armanca derbaskirin û dagirtina demê ye (têderxistonek, zûgotinok) Ji bona gelek netewan vê hunera veguhestinê bi hemû keresteyên wê ve çavkanieyeke girîng e ji bona hînbûn û parastina ziman.

«Lîtêrtûra derca tekstê zargotina

xwerû tên ragahandin.Tu navgîn di navbera peyvbêj û guhdaran de tune ye. Dijberî wê di çanda nivîskî de têkilyeke navgînî heye bi rêya pirtûkê. Çalakiya nivîsandinê hewildaneke kesayetî ye û xwebixweyî ye cudayî pêkanîna hunera zargotinî ye ku di hundirê wê de kiryareke civakî peyda dibe.

Di serdema niha de li hemû cîhanê ev du modêl bi hev re dijîn, di asta gelek netewan de jî tu netew ji sedî sed xwedî çandeke devkî yan çandeke nivîskî tune ne. Li gorî hin xebat û lêkolînên zanistî « zargotinî » di sê qonaxan re derbas dibe:

a. Zargotiniya Yekemîn: Hemû berhemên ku cara yekemîn û bi awayekî xwezayî ji devê hilberînerên hunera devkî ve dighîje guhdaran.

b. Zargotiniya Duyemîn: Hemû berhemên devkî ku bi rêya teknîkên deng û wêne yan nivîsandinê tên tomar kirin bêyî ku werin guhertin têne veguhestin.

c. Zargotiniya Sêyemîn: Hemû berhemên hunerî yên ku tên afirandin bi şêwazeke nûjen, lê jêderên xwe ji wêjeya devkî distînin. Adaptasyonên di warê şanoyî de weke mînak.

Ev metin û berhem bi devan ji nifşekî heya nifşekî din bi sedê salan hatine veguhestin. Helbet ji bona di nava civakekê de biherikin, belavbibin û her tim werin bikaranîn, hunera devkî xwe li ser hinek hîman û taybetmendiyan daye avakirin. Emê çendekan ji wan bînin ziman û şîrove bikin:

II. Hîm û bingehên hunera zargotinî

a. Statûya Bêjeyê (Gotinê):

Kurd dibêjin:''ziman digere, dev dibêje'', dev û ziman taybetmendiyên mirov in, mirov bi wan lebatan kesayetiya xwe vedibêje û dide nasîn. Di serdema mirovahiyê de dema ku bi tevgera zimên deng bi dev ket, mirovan jî wate li wan dengan bar kirin, bi vê yekê'' bêje'' hat sazkirin. Bêjeyê hîm û bingeha hunera wêjeyî danî, çi çax ku hunera devkî veguherî wêjeya devkî, wê demê wêjeya devkî rê li ber jiyana mirovahiyê vekir. Mirovahiyê di serencama xwe ya dîrokê de hemû deriyên girtî bi efsûna bêjeyê li ber xwe vekir, bi hêza bêjeyê xwe gihand qad û qonaxên nû. Der barê pîrozîya bêjeyê û bandora wê de Kurd dibêjin: “Gotinên mezinan, nexşê ser keviran”, “Gotina xweş mara ji qulê derdixe”. (Bîlal Hesen).

Bêje li ba hin kêmnetewên afrîkayî jî peyv wateyên taybet distîne. Li cem êla Pul ‘’ peyv mîna bayê ye. Kaniya wê hişk û zuha nabe. Kes nikare hundirê wê tijî bike. Peyv mîna avê ye; ger carekê herikî dijwar e ku mirov ji nû ve berhev bike”.

Di nêrîna wan de kesayetiya mirovan bi rêya peyvê tê pîvandin, ango hebûna mirovan di axaftina wan de tekez dibe. Berevajî vê yekê rojavayî hebûna mirovan di hişê wan de dibînin mîna Descartes gotî ‘’Ez dihizirim, tê

I.Têgeha hunera devkî

Ev teyorî, di encama xebatên li ser destanên Homîros ji aliyê fîlologê amêrîkî Milman Parry ve di salên 1930î de hate pêşxitin. Li gorî vê teyoriyê destanên Homîros di çarçoveya kelepora devkî de hatibûn ristandin. Pergala hûnandina wê destanê weke "Formûl" hatiye bi nav kirin; ango mirov dikarîbû bi awayekî sererast û zindî hemû malikên wê helbestê bêyî ku xwe bispêre nivîsandinê ezber bikira û ji milet re bigota.

Di bingeha xwe de zargotinî dibe mijareke nêzîkbûneke hevrûkirinê de navbera hunera devkî ya pir gelan de ji ber ku li hin deverên din jî ev pergala hûnandinê ya taybet hebû û ev teyorî tekez bû dema Parry xebatên xwe li ser destanên Sêrbî li Yogoslaviyayê berdewm kirin. Piştî mirina Parry di sala 1935an de, lêkolînerên mîna Albert Lord, Adam Parry xebatên li ser teyoriya zargotinî birêvebirin. Di serdema kevin a Yonaniyan de jî gelek çîrokên efsanewî û olî bi devan dihatin veguhastin beriya ku bêne nivîsandin. Ji van ên herî bi navûdeng Ilîada û Odêsa.

Ursula Baumgardt, pispora wêjeya devkî ya afrîkî ye dibêje ku dema behsa devkbûnê tê kirin, divê mirov vê têgehê "wêjeya devkî" baş zelal bike, bi gîştî di salên 1970 î de di nava qada wêjeya anglofonî û frankofonî de hate bikaranîn.

Li gorî çavdêriyên nû, qada zargotinê ne li gorî pîvaneke hîyêrarşîk di navbera devkî û nivîskî de tê destgirtin, ango ne ku devkî paşdemayî ye û nivskî pêşketî ye, lê belê her qadek şêwazeke taybet a derbirandinê ye:

"Devokî taybetmendiya danûstandineke ku li ser bingeha taybetmendiya têgihîştina bihîstwerî ya peyamê pêk tê. Nivîsandin taybetmendiya danûstandineke ku li ser bingehek îmtiyaz a têgihîştina dîtbarî ya peyamê pêk tê" (Louis-Jean CALVET, Kevneşopiya devkî, Que sais-je, PUF, Paris, 1984, r.6)

Berhemên wêjeyî du beş in, yek ji wan devkî ye, ya din jî nivîskî ye. Herdu qad hevdu temam dikin, ne ku yek kêmtir an girîntir e ji ya din. Calvet vê hevsengiyê wiha dinirxîne: "Bêje bersivekê ji pirsgirêkên civakekê re vediguhizîne û nivîs jî bersiveke din pêşkê dike. Ew her du şêwazên çandî ne." "Kevneşopiya devkî"

Têgeha kelepûra çandî ya manewî ji aliyê Unesco "Rêxistina Perwerde û Hîndekarî ya Navneteweyî" ve di 17 cotmeha sala 2003 an de di bin slogana "Kelepûra çandî çavkaniya çandên cihêreng e û berdewamiya wê misogeriya afrandinê ye" peymaneke îmze kir. Wêjeya devkî jî bû beşeke girîng ku cihê xwe di nava vê peymana ku niha 180 welatan cihê xwe tê de digirin. Lê belê mînak ji ber ku Kurd miletê herî mezin yê bê dewlet e, bê statû ne, di encamê de kelepûra çandî ya manewî ya Kurdan pir kêm di nava lîsteya Unesco'yê tê dîtin an naskirin.

Danûstandin û pêwendiyên rastererast taybetmendiyeke wêjeya devkî ye, gotin û axaftin di dema hilberîna wan a xwezayî de û bi rengekî

Bi seatê, bi deqê, bi çarîkê, kêlî bi kêlî bang dikim Têlî
Ji axîn û kedera dilê xwe re dibêjim Têlîî
Têliyê tu hur î, boz î, beyaz î, xalis î muxils î, beyt el emîn î, li ber dilê min kihêl î
((…..))
Bihar e, bihar e, bihar e, bihar e, bihar e
Erê lê lê zalimêêê
Lê Têliyê, bihar e, bihara rengîn e zalimê qîza zalimayê
Di biniya me de Bîngol e, di ser me re zozana Serhedê şerefdîn e….

Belê, dengbêjên deng zîz û xwedî qirikên zêrîn «Têlî» bi rêya stîleke taybet ji Serhedê ta bi Çiyayê Kurmênc vegotine. Her wiha bi sedan çîrok, destan, efsane, kilam, gotinên pêşiyan û gelek cureyên din bi saya bikaranîna hunera devkî ji nifşekî hatine veguhestin nifşeke din û bi vî rengî heya dema me ya îro di nava civakê de zindî mane. Ji ber sedemên cuda û tevî ku Kurdan nivîs jî bikaraniye, lê belê di danûstandin û xwe derbirandinê de, çanda devkî serwer bûye.

Ev rewş ji bo komên civakî yên curbecur li seranserî cîhanê jî derbasdar e. Li gorî dane û lêkolînên van pêncî şêst salên dawî, hatiye dîtin ku civakên bindest ên li ser cografieke berferh dijîn, li derveyî çand û zimanê fermî yên dezgehên desthilatdaran, zanîn, tecrûbe û nirxên xwe bi devkî anîne ziman. Bikaranîna vê şêwaza devkî ya derbirandinê bûye stûna bingehîn a van civakan. Piştî çavdêriyeke dem dirêj ji van civakan re, berhêmên wan ên ku bi awayekî devkî hatine afrandin û veguhestin bûne qadeke taybet a xebatên zanistî: Jean Cauvin ku heşt salan li Afrîkayê di nava civaka Mînyanka de ma bû, û hem jî fêrî zimanê wan bûye di pirtûka xwe ya bi navê «Têghiştina bêjeya kevneşopî» 1980î pênaseyeke bi vî rengî pêşkêş dike:

«Civaka devkî hebûna xwe ya hundirîn, bîra xwe, zanîna xwe, liv û tevgerên xwe yên xwedî nirx, dîroka xwe, taybetmendiya xwe bi awayê ragihandina devkî ve girêdaye. Ango, ne tenê di dema niha de pevguhertina peyaman heye, her wiha di navbera rabirdû û îroyîn de jî pevguherînek heye, bi vî rengî van civakan xwe di nava civakên din de xwe mayînde kirine» r.6

Em dixwazin di vê gotarê de, pêşîn di çarçoveya teyorî û xebatên zanistî de, ji aliyê termînoljîk –têgînî ve çanda devkî bidin pênase kirin, piştre em ê hewil bidin bersiva vê pirsê bidin; gelo ji bona mayîndabûna xwe hunera devkî xwe li ser kîjan hîm û bingehan daye ava kirin? Di dawiyê de, em ê di çend xalan de girîngî û peywirên vê hunera devkî dest nîşan bikin. Divê têgihştina me ji metin û berhêmên devkî re li gorî çi şêwaz û metodan be?

Wêjeya Devkî Di Çarçoveya Teyorî û Rêbazên Lêkolînê Yên Nûjen De

Berhemên zargotinê amûrine bingehin di avakirina hişmendiya nasnameyî û hevgirtina civakî de. Bi rêya vê kelepûrê nirxên îdolojîk ên her miletekî tên veguhestin..

Gulîstan Sîdo*

Were Têlî Têêêlî Têlî were Têlîî were Têlî Têlî Têlî
De lê lê zailmê êê ê
Ez serê sibê ji xewka şêrîn radibim dibêjim Têlî
Nava royê dibêjim Têlî
Êvarê dibêjim Têlî

*Xwendekara doktorayê li Inalco, Peymangeha Netewî ya Ziman û Şaristaniyên Rojhilatî. Parîs.

di me de hebû? Û misoger gotine û bi me ve kirine. Ji ew fermanberê nifusê re ku ev yek dîtiye bijî! Erê rewşeke tolgeriyê ya hewlnak heye. Di 1920'an de çawa tespîtkirin ku ezê ji van tiştên pêkhatî hemûyan tolê bigrim? Di pirtûka Îsmet Îmset de tiştekî balkêş tê gotin: fermanberekî nifusê hatiye. Qaşo kalikê min Şêx Sêîd bi dar ve kirine. Bêguman ne kalikê min e, lê wisa dinivîse. Wê demê gotine em paşnavê wan bikin tolhildan. Balkêş, tolhildan? Di bîstan de û kemalîstan bi xwe ev lê kirine. Nakokiyeke balkêş e. Ji heft saliya xwe û pê ve têkîlî û nakokiya malbatê ya hetanî roja îro, vediguhere nakokiya mezin a malbata mirovahiyê. Em dixwazin parçeyeke bijarte ji malbata mirovahiyê bidin rûnişkandin. Bêguman sedem û çawaniyên vê em çiqas rave bikin jî bi hemû aliyan ve baş zelal nabe. Ev karê romanên mezin in. Di dema pêş de romanîkirina mezin, belkî van hewlan dikare hindekî di asta hunerî de reng bide. Weke ku min niha gotiye, ez niha bi aliyên wê yên îdeolojîk, rêxistinî û leşkerî ve mijul dibim. Bêguman vebêja bi şêwaza zimanê wêjeyî anîna ziman girîng e. Girtina asta hunerî girîng e. Me behsa asta civakî kir. Wisa em di rewşa kesên bêfêm de nînin. Xayin jî di nav de yê ku hemû kesî dide meşandin em in. Xayin jî ger em nebin nikarin bijîn.

Ew xayinên me ne. Ji ber me dijîn, wisa xafil in.

Dijminên me jî tevnokên berjevendiyan avakirine û naxwazin ji vî şerî bigerin. Em dijminê xwe jî didin jiyankirin.

Mezinahî, yekgirtin e.

Lê bêguman, ji ber ku em afirandêrên van in, em dest ji tekoşînê jî bernadin. Divê em bizanibin wan wisa weke dijminên dîrokî bifetisînin.

Eşkerekirina dijmin gaveke girîng e. Ew xayinên kevin in, xafilên kevin in. Ev dijmin, dijminê hezarê salan e, lê xwe veşartiye, eşkere nebûye. Di kavilê berxan de xwe mîna guran raber dike. Ji lawiran xirabtir e, lê bi pîvanên hemdem mirovan dibîne. Destpêkê me eşkere kir ew bi ser xist. Karê eşkerekirinê dibe ku hindekî din were berfirehkirin. Lê ji bo kesên ku dixwazin şer bikin ev yek bes e. Bêguman ev yek têr nake. Yek jî divê ya hatiye eşkerekirin were dîtin.

Tê zanîn ku, bi şidandina kulmên di tariyê de dijmin nayê lêdan.

Min ev dijmin çawa anî vê rewşê? Divê misoger were zanîn. Bi şêwaza min a razana di kozikê de ve girêdayî ye. Di şêwaza meşê de bi bênefesmayîna min re têkîldar e. Divê were zanîn û lêgerînkirin ku ka çawa ez li Rojhilatanavîn jiyame. Divê hemû pêwendiyên min werin hînbûn, bi taybetî pêwendiyên bingehîn. Ya bingeh, pêwendiyeke çiya ya pir pêwîst, têkîliyeke dostaneyî, têkîliyeke çekê, têkîliyeke kêşanê, divê ev bi tevahî werin girtin û berfireh werin nirxandin. Mirov dikare encamên mezin derbixe.

raber dike. Ger qesrên min jî hebin, ji bo ku ew bibin saziyên neteweyî ez ê wan bost bi bost bi kar bînim, lê ji bo xwe.
Di temenê herî ciwan de min xwe wenda nekir, hezkirin û rêzgirtin min rast nedît. Min hema zarokên din ên gund re yekîtiyek saz kir, heta bi zarokên malbata herî dijber re jî.
Ji ber ku min şêwaza têkîliya xwe her roj bi dorhêliyê, weke ku bi hors pola bikutim zexm kiriye, min îro rê li ber têkîliyeke netewî û heta rê li ber têkîliyeke gerdûnî vekiriye. Dema hindek zêde bi min ve hatin girêdan an jî zêde hezkirin li hember wan ez bûm xwedî helwest. Ez pê dihesim ku li wê derê kêmaniyek heye. Ji ber ku ez şêwaza xwe ya hezkirinê, şêwaza xwe ya girêdanê bi hêsanî erzan nakim an jî ber bi xirabiyê ve nabim. Xala herî ku ez tê de hesas im ev e. Ger min ne têkiliya neteweyî, min têkiliya erzan a girêdanê qebûl kiriba, divya ku ez encax bibama reîsekî malê. Ez jî nedibûm yekî wisa.
Ne ez xwe bi hêsanî diecibînim, ne jî dixwazim bila tu kes bi hêsanî min biecibîne. Lê ez dev ji tu tiştan jî bernadim, hemû mirovahî jî tevlî vê yekê. Xwedî israr im, xwedî hewl im û di encamê de jî pêşveçûnê derdixim holê.
Ji bo her kesî ez gelekî dihizirim.
Bi demjimêran li rûyên wan dinihêrim, bêyî ku aciz bibim diaxivim, vêdibêjim. Bêwestan. Di we de ev yek nîne. Awir nînin, dil nîne. Bêguman ez zindî dikim, hilrakirina hişmendiyê ye. Hilrakirina dil e.
Ez lîstikvan im. Tenê yek roja min jî bêperoşmendî derbas nabe. Di rojan de peroşmendiyeke awarte heye û him jî di peroşmendiyan de dubarekirin nîne. Jiyaneke erjeng peroşmend e. Her roj bi navê min bi sedan çalakiyên balkêş hene. Her demjimêr dilê mirovan tîne ber devên mirov. Dîsa jî besî peroşmendiyên min nakin. Mesela qehreman hene, bi sedan hene. Çalakiyên wan min têr nakin. Ez zêdetir dixwazim.
Vaye keç hene. Keç jî mirov peroşmend dikin. Bi sedan hene, qet min têr nakin. Ez dibêjim zêdetir, em ê yên mezintir li ku bibînin? Ez dibêjim serkeftinên mezin li ku derê ne? Hun dibêjin xeyal. Bêguman tiştên ku ez dikim ji bo wan amadekariyên biçûk in. Bi ew jîriya 25 saliyan ez çûbama welat şer, ma min dê bi van çekan ve, bi van derfetan ve, li vî welatî û li hember vî dijminî yan jî van hevalan çi nekiriba..?
Vaye bezên min ên di zaroktiyê de hene, wisa bi peroşmendî. Di pêvajoyên dawiyê de jî bezîn, bezîn, dîtin, dîtin, ji nû ve lêgerîn, lêgerîn, dîtin, bezîn, dîtin, ji nû ve armanc diyar bike û her roj bibeze. Misoger dubarekirin jî nîne, têrbûn jî nîne. Ka ji mîtroyekê ve dest pê dikin, santîm bi santîm bilind dikin. Rekor li ser rekorê ye. Li gor xwe ez ben hîna bilind dikim, hilbiavêje ha hilbiavêje, bi peroşmeniyeke mezin.
Bêguman cîhana şoreşger wisa ye.
Pir balkêş e! Esas ezê ji vê re bibêjim tolhildan, ev paşnav çima li me kirin? Sosret dimînim. Ev taybetmendî çawa

Û em hîna jî bi kûrkirina vê hewlê re mijûl in.
Gelo ma hun vê yekê çawa fêm dikin? Ji bo xwe, erê bi rastî jî ne bi gotinan, di pêkanînê de jî ez li ser tu sûdeke wisa nahizirim. Lê ji bo serkeftina nirxên bingehîn, ez şervanekî gelekî dijwar im. Ez pir vekirî bibêjim, li derûdora min nirx dicivin. Ew nirxên ku gelek ji we van di xewnên xwe de jî nabînin. Ev ji bo min jî derbasdar in. Lê baldar bin, ez dibêjim ku divê ev tenê weke nirxên azadiyê, rizgariyê, netewiyê û yên hevpar werin fêmkirin. Tu mafê min li ser min jî nîne.
Carna ez ji xwe re dibêjim "ey Apo", tu mirovek î. Her çibe jî roja me weke pêwistiyeke mafê mirovan xwedî wate ye. Vaye weke pêwîstiyeke mafê mirovan wisa bi tenduristî, wisa tu jî bibe xwedî jiyaneke taybet a tê pejirîn. Ez bi xwe ji mafên herî bingeh ên mirovan bêpar im. Mafê min ê gerê nîne, rast û dirûst mafê min ê ku ez pêwistiyên xwe yên kesî pêk bînim nîne. Çima? ji ber ku divê xebateke leşkerî be. Niha ez ji xwe re zêde derfeta karê taybet nadim. Ez neçarim li hember xwe jî pir sotîner bim. Ji ber ku ger bibêjim mafê takekesî; dê mafê gştî û mafê gel zerarê bibîne. Dê şer zerarê bibîne.
Her kes xwedî mafê kişandina cigarê ye, lê ya min nîne. Her kes xwedî mafê xewkirineke rihet e, lê ya min nîne. Heta her kes bêwestîn xwedî mafê rûniştinê ye, lê ya min nîne. Berovajiya vê, peywira min a ji piyan sekiniyê û tekoşîn dayînê heye.
Eşkere ye, maf in, ez dibêjim peywir heye û peywireke esas e. Naxwe ger ez jî bixwazim xewkirineke rihet bikim, hindekî bêhna xwe berdim. Niha derfetên min ji hemû kesên Kurdistanê zêdetir in. Ger bala we li ser be kesekî herî azad tevbigere hebe ew jî ez im. Lê ruxmî vê yekê rewşa min ev e. Çima?
Dîsa bi rastiya şer re pêwendîdar e.
Ji bo ku tu di şerî heyî de têk neçî divê tu wisa tevbigerî.
Zarokek belkî dikare çil qatî hindek tiştan hîn bibe û bijî. Lê ez bi qandî zarokekî jî hindek tiştan hîn nabin û najîm. Ez di nava tengezariyeke wisa de me. Çima? ji ber ku ez bi armanca bingehîn ve girêdayî me. Ez ewqas bi armanca bingehîn ve girêdayî me ku, ez bi zimanekî din nikarim du peyvan bînim gel hev û pê biaxivim. Ez lîstikê jî nikarim du deqeyan bilêyîzim. Ji ber ku lingên min her armancekê ve girêdayî ne. Li gor wê dimeşin. Tu deman li derveyî armancê ez gavên şaş navêjim.
Dîsa nefes bi nefes min dilê xwe bi nirxên bingeh ve girêdaye. Ne weke we bi şêweyeke herî erzan dilê xwe firotin, ez tozê jî lê nakim. Ji ber ku di wê de girêdana bi nirxa pîroz ve heye. Gel evqas bi min ve tê girêdan, lê hîna di der barê xwe de ez piçekî jî xwedî şanaz nînim. Berdin evîndariya li xwe, hîna bi behiciyane ez xwe bi armancên bingeh ve girêdidim.
Ez hîna qetek nan jî li erdê nahêlim, nahêlim tu kes biavêje sergoyê. Ev yek nêzîkatiya min a ji nirxên madî re

ev îro hêviyê diafrîne, ger misoger vegeriyaye hêviya serkeftinê, ew mafê gel e. Ez xwe têkilî vê nakim. Ez xeyalên hêviyê yên taybet belav nakim. Ji tu kesî re jî derveyî şêwaza xwe hêviya serkeftinê pêş nabînim. Heta wisa xwe dayîna baweriyên serkeftinê zêde guncaw nabînim. Rastiya serkeftina min ev e.

Jiyana min e, şêwaza min e, tempoya min e, uslubê min e û di her cihî de derbasdar e.

Mezinahiya min di ku derê de ye?

Ev çil sal in li dûv çareseriya nakokiyan im û hindekî jî çareser dikim. Min dijminê esas tespît kiriye. Bêguman, ji bo naskirina dijmin peyv tune bû. Îro bi zanistiyeke qandî deryayê me gihandiye rewşeke bênefes. Kemalîzm bênefes hate hiştin. Hemû îdeolojiyên paşverû bênefes hatine hiştin. Heta bêpolîtîka hatine hiştin. Çima? min kir. Min xwe ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve daye û min kir. Em ê artêşa wan jî bênefes bihêlin.

Erê bi tena serê xwe min hemû pêvajo hildan ser milên xwe. Min hetanî vê derê anî. Îro ew zilamê ku bi evqas derfet jî nikaribe xwe bi pêş bixe mafê wî ji tu tiştî re nîne. Û ez jî wî nas nakim. Ez ev im. Ez xwe li dij dijmin wisa amade dikim û wisa didim şerkirin.

Her çawa be jî mirov dikare xwe biafrîne û her dem pêşveçûnên mezin ava bike. Ger mirov wisa jî temaşe neke, nabe. Ruxmî ku xwedî gelekî pirsgirêk e, ruxmî ku me pirsgirêkên herî bingeh xistine rojevê li ser van neponijîn, xwediyên pirsgirêkan dixe rewşeke xirab û qonaxeke hesabdayînê. Bi salan e ji bo di karê dayîna hesab de ji bo ez kêmaniyan nekim, ez gelekî hesas nêz bûm. Jixwe di Kurdistanê de cara yekem em rêxistineke bi vî awayî pêk tînin. Ji bo neketina kêmaniyan bi qandî sebreke mezin, em zirav dihunin û şidyayî didurin. Ji ber ku ez kêm zêde dizanim ku ka ez bi kelûpeleke çawa re rû bi rû me. Di vê mijarê de divê mirov zêde dilpak nebe. Lê gelek caran jî ez ji xwe dipirsim, "gelo ma ez ê hîna çi qasî din li ber xwe bidim?" Yanî hîna şîreta dayîka min e: Tu bi van re mijûl dibî, lê ma dê ev weke hizra te derbikevin? An jî hewla ku tu raber dikî, fedakarî, ma dê bersiva van hemû bi serdeçûyînên te werin dayîn. Ev tenê hetanî ku karê xwe bi te re biqedînin weke bi te re ne dê xwe diyar bikin û piştre jî dê her kes li xwe binêre." Bêguman, ev rastiyeke hişk a jiyana me ya madî û materyalist e. Rast e jî, lê rastiya kê ye? Ev rastî xizmeta kê dike? Ez hîna ji wê demê ve li hember vê yekê rikdar im. Ev kes weke kesên ku ez daxwaz dikim nabin, lê wekbûna wan a bi xwe jî bi kêrî pênc qirûşan nake.

Ew roj ev roj e heman çîrok didome.

Viyana şoreşger wisa rabû ji piyan. Pêşveçûyînên ku qet nedihatin hêvîkirin jî pêk hatin. Qural û pîvanên ciheyî li gor min têr nedikir. Her dervehiya cihwariyê, ji bo civakeke gund an jî bajar hindekî derketina derveyî quralan, her ku diçû ji min re weke îfadeyeke azadiyê disepand.

Lewra em aştîgerên pir xwezayî ne. Em jînê bi aştiyê pênase dikin. Jiyîn aştî ye. Ez bawer im ku em îfadeya herî bijarte ya vê yekê ne. Misogere ku ez vê yekê temsîl dikim. Lê were li vê sosretê temaşe bike ku li ser jîna aştî, aştiya jînê wisa bi şerê taybet azîneyên gemarî hatine bikaranîn ku, yekî weke min newêrekê zorê jî neçar dimîne serî li zorê bide.

Hîna gundiyên me dibêjin. "mirovekî wisa ye ku moriyekê naêşîne." Rast e. Ne tenê moriyekê ez ditirsim parçeyeke giha jî bişkînim. Lê kîjan demê min dît ku pêşiya jînê bi tevahî hate girtin, pêşiya daxwaziyan hate astengkirin û pêşiya berzbûnê hate birîn, wê demê min xwast ez gelekî biaxivim û gelekî nîqaş bikim. Min dît ev yek jî wisa hêsan nîne. Ji zû ve pêşiya vê yekê jî hatiye girtin û min dît ku hêzeke zorê li ser tê pêkanîn. Dîsa ruxmî ku ez qet ne amadebûm, ruxmî ku ez bi qandî kesên din wêrek û fedakar nebûm, ez eşkere diyar dikim ku min ev yek dît.

Divê şêwaza min a jiyanê baş were berhevkirin. Ez pir tirskar im, di vê wateyê de navê min ê din jî tirsonek e. Dibe ku ez wisa bim jî, lê bi rastî jî dema hemû rêkên jiyanê hatin xetimîn, dema hemû teşeyên şanaziyê di bin lingan de hatin perçiqandin, dema min dît êdî tu xalên bergehê neman (bêguman ez di wateya mirovê şanaz de dibêjim), min bi neçarî dest bi van karan kir. Di hunera şer de kesekî weke min tirsonek, îro bi şêweyê herî pêşveçûyîna pisporiya wî ya di vê hunerê de nakokiyeke. Lê vê yekê wisa dest pê kir. Ev yek tê wê wateyê ku, bi jiyan û aştiyeke mezin ve, kesê xwedî îdia, israr, bêxiyanetiya ji jînê re, bi şêwaza fermana pergalê nepêşwazî kirina jiyanê, berxwedana li hember pergalê, dîsa serî netewandina li hember koledariyê ve (ger dixwaze bi rastiya xwe re yek be, ger naxwaze xiyanetê li îdiaya xwe bike, ger dixwaze biryariya xwe ya jiyanê misoger bidomîne) û kesê dixwaze jînê bi aştî û azadiyê ve bimeşîne, misgoer divê vê hunerê bidomîne.

Ez pêwîstiya mayîna tendurist tînim ser ziman. Ji kesên xwedî birîn re dibêjim ku divê mirov şanaz bimîne. Ji kesên xwedî şanaziyên gemarî re, yên di bin lingan de hatine perçiqandin re dibêjim. Ne girîng e ku ev yek ji rêveberên şerê taybet re derbe ye yan na. Ev şêwaza min e. Ez ev im. Bi ihtimaleke mezin jî ez ê wisa bi encam bibim.

Tu niyeteke me ya wisa jî nîne ku ez nûçeyeke xerîb weke ewleyiya serkeftinê û misogeriya serkeftina gel bidim. Di vê mijarê de jî şêwaza min şêwaza serkeftinê ye. Divê ne kes ji bo nepêkhatina xeyalên min, min rexne bike û ne jî divê tu kes nirxanên li ser paşvemayîna serkeftinê bike. Ji bo serkeftin destpêk û dawî ye. Tenê her kêliyeke serkeftin li ser hev dicive, di hindek serdeman de weke pêngavekê derdikeve. Her rojeke min, her kêlikeke min xelekeke serkeftinê ye. Di min de şikestina xelekan nîne. Tu rojekê bi paş ve namîne. Ev şêwaza xwerêxistinkirina kesekî ye. Ger

Pir eşkere li holê ye ku her kêliyekê nêzîkatiyên min çawa bilind dibin.
Min xwe da destpêkirin ne wisa?
Min raber kir û didome.
Çiqas bêçare, çiqas bêkes, çiqas bêderfetî, çiqas serê xwe li rast û çepê didim, çiqas li erdê û asîman dimêyzînim, çiqas li guran-çûkan, maran-mişkan temaşe dikim, çiqas li hewayê, avê hemû tiştên li xwezayê peyda ne, çi tiştên li civakê peyda ne temaşe dikim û dixwazim çareseriyekê peyda bikim.
Rêz ev e.
Fetihkirina jiyanê, fetihkirina şer, fetihkirina mirov û çi pêwîst dike bi wî re xwe fetihkirin.
We dît, ez çi ji xwe dikim?
Niha tirsa artêşa dijmin mezin e. Me çawa rê li ber wêrekiya nava me vekir? Bi hêzê me ev yek kir. Me ev yek bi kar kir.
Di aliyê madî de jî, ji bo ku ez deh qirûşan ji bavê xwe bigrim, bi qareqar bi girîn û nalîn min qiyamet radikir. Ger niha em bibêjin alîkariyek gel hebûn û nebûna xwe derdixe holê. Niha ref bi ref mirov, ji bo bi mirinî her tiştê xwe bidin çawa tên nava refan? Ma ne wisa bû ku bira ji bira re nedibû alîkar. Ên herî nêz derveyî berjewendiyên xwe gav nediavêtin. Ev yek çawa hate afirandin? Ez gelekî baş dizanim ku Kurdan berê ji bo bostek ax birayê xwe dikuşt. Ji bo sê yan jî pisîkekê cîranên xwe dikuştin. Niha çawa hate vê fedakariyê? Berê ji bo dîtina keçekê xort deh salan li xurbetan diman. Ji bo qelenekê, him jî ji bo têkîliyeke bêdil, ji bo têkîliyeke koleyane. Lê niha pêl bi pêl jin tên. Me ev yek çawa afirand? Me çawa afirand ku hetanî dawiyê hebûna xwe tunebûna xwe dadixîne holê, divê ev yek were fêmkirin.
Dema em zarok bûn jî me xeyal ava dikirin, belkî her kes xwedî van xeyalan e. Lê nayê zanîn ku ka dê çawa ew xeyal veguherin romaneke mezin û çawa bi jiyanê re bibin yek. Ev bû nasîbê min an jî ji min re bû bar. Êdî gelo ev fermana xwedê bû, yan jî paşverûtiyên mezin, ketinên mezin û jiyana fêdîkar bû ya em xistin nava vê? Yan jî azweriyên me bi xwe bûn?
Belkî hema hemu jî tê de xwedî rol bûn. Encam mafê jiyaneke wisa. Ez weke qederekê jî nabêjim, weke jiyaneke ji berê de were tercîhkirin û bi vîna azad were bidestxistin hat em dîtin.
Yên qehr dibin bila qehr bin, ên dijîn bila bijîn.
Û em naxwezin bila tu kes wisa bi hêsanî wenda bike. Berovajiyê vê yekê em ji dijmin re jî dibêjin. Qet nebe dijmingeriya xwe li gor zagonên şer bike, evqas pêwîstî bi dînbûna şerê taybet nîne. Wî hemû dînokiyên mezin ên şer kirin, hemû zagonên babistinî yên dîroka şer bin pêkirin. Esas li gor zagonên şer jî dikarîbû me biperçiqîne. Mixabin gemar kir. Navê şerekî weke şerekî pir qirêj di dîrokê de nivîsandin. Bêguman em jî neçar man ku em aliyê şer ê pîroz kûr bikin.
Ev şerê ku em dimeşînin pîroz e. Belkî jî yek ji şerên herî pîroz e. Ev jî bû malê dîrokê.

him zilam kesên ku li ser bingehê xiyanetê, bingehê koledariyê nêz bibe ez ê bi kar bînim. Ez eşkere dibêjim, ez dikarim zilam ji jinan xirabtir bikim. Ger li ser bingehê xiyanetê nêz dibe, ger li ser bingehê ketîbûnê nêz dibe, ez dikarim jinê hezar caran ji jintiyê bidim poşmankirin. Di vê mijarê de şerê min gelekî dijwar e. Ez ê jînê li wê heram bikim.

Ez zagonekê li ser we bar dikim.

Zagona rast hezkirinê.

Zagona gihiştina azadiyê.

Li ser vê bingehê zagona dirêjbûna ji jinekê re û ji têkiliyekê re. Min got têkiliya hêsan nabe. Ev yek ji bo min jî derbasdar e.

Ez evqas ji bo azadiyê şer dikim, evqas ji bo azadiya jinê şer dikim û ev yek ji bo min destpêkeke. Na ger kes bibêje, "hêza min heye, bandora min heye ez hema jinekê bigrim bin desthilatdariya xwe" dikare vê yekê bike. Lê bi vê yekê re dê çi wenda bike? Dê mezinahiya xwe wenda bike, dê radestiyê bijî. Di vê rewşê de, ez ê pê bihesim ku li dij, rêgeza rizgariya jinê ye û berovajiyê rêgeza rizgariya jinê tevdigere. Ez ê jî ji wî sûdê werbigrim, di her teşeyê tiştên erzan de bi kar bînim. Vaye pir di ser re derbas bû, ka mezinahiya te li ku ma? Hun dizanin ji bo ku ez jî xwe mezin bigrim, ez neçarim ku tekoşîneke mezin bidim.

We tenê jinek xist hişên xwe û dilê xwe. We got, "wisa hezkirina min, wisa evîna min" an jî jinek we wisa qebûl dike, wisa hate girêdan. Ma hun dê çawa vê yekê qebûl bikin? Li gor min, tu yê ji sedî yek wê di dilê xwe de hîs bikî, ji sedî nod û neh jî bidî parastina nirxên din. Pîvanên min bi xwe hene. Jinek, an jî kesekî ji rêzê, zilam jî, bila were gel min û bi çav reşî bibêje, "ez evqasî bi te ve girêdayî me!"... Ez ê bibêjim ez serok im, ev jî tê wateya Kurdistan. Kurdistan jî tê wateya şer. Tu tiştekî din ez qebûl nakim. Ez ê bibêjim, "ji min pirtir hindek nirxên hêjayî girêdaniyê hene." Welatekî min heye. Di encam de ev yek wisa ye û em hişyariyeke mezin pêk tînin.

Tu yê evqas ji welatê xwe hez bikî, tu yê evqas ji mirovan hez bikî. Huner heye, zanistî heye, evqas asta civakî heye, tu yê wan jî bibînî. Piştre bêguman hindek nirxên bingeh hene, piştî van hemûyan, tu yê hezkirinê, tekîliyê, têkîliya hevjîn-dostaniyê binirxînî.

Hun di nava me de dîroka şeydayan dizanin. Çîrokên weke Leyla –Mecnun ku çavên wan tu tiştî nabînin we gelekî bihîstine. Ger her tişt wisa be, tu yê jî wisa biqedî. Ji kesekî ku wisa xwe di nava hestan de fetisandiye û evqas xwe bi kesekî fetisandiye xêr nayê. Çi ye ev? Vaye divê di vê xalê de, em aliyê civakê yê mezin bi aliyê asta azadiyê ya mezin re bigihînin hevsengiyê.

Û em çawa dikarin ji jinê ev hestyariya mezin rabikin? Ev bêçareyiya mezin a li ser tekiliya serdest a Kurd em çawa ji holê radikin?

Ji ber nêzîkatiya hevsengî. Serokatî ev e.

Ez tevgera mezin a serhildanê me. Ez tevgereke mezin a çareseriyê me. Ez tevgera mezin a rêxistinê me.

û dixwaze bi karanîna jinikatiya xwe ve me ji rê derbixe û kontrol bike. Hişên xwe ji bo vê yekê bi kar tîne. Bi me re ji bo sosyalîzmê, ji bo rizgariya hiştên xwe bi kar bîne... na! Tiştekî wisa nahizire. Berovajiyê vê dixwaze van çekan ji destên me bigre, ji bo armancên xwe yên bêyom (ugursuz) bi kar bîne, bi xwe spartina me ve binkeya rêxistinî xirab bike û misoger rê nede bilindbûnekê.... Min tu kes weke wê nedît ku bi navê pergalê şer bike. Tu kesî ku bi fêmkariya me re wisa hunerên xwe yên jiniktiyê bi kar aniye bi rastî min nedît. Ji jiniktiyê jî wêdetir, esas gotina jiniktî-zilamtî jî ne di cih de ye. Bi kesayeteke pir cewaz dixwaze pêşiya me bibire. Bi vî awayî dida zanîn ku "ka ez çawa cîhanê difetisînim."

Mirov dikare bibêje "şahbanuya tariyan"

Weke ku min gotiye tu caran tarîtî ji serê xwe kêm nekir.

Ji ber li dij cîhana me ya bilindbûnê, temsîlkareke rikdar û hişmend a pergala kifnikî bû neçar bû ku em wisa dijberî hev.

Ma dikarîbû veguheriya?

Tê wê wateyê ku kesayeteke ku wisa hatiye stirîn xwedî şensê veguhertinê nîne. Jixwe ger em zêde bi ser ve çûyîbana dê bişkesta û bimira. Ji bo van mirov nikare behsa veguhertinê bike. Û armanca wê ya bingeh jî, bi şêweyeke pir jandar serpêhatiya PKKê bi dawî bike, û weke ku provakatorê din gotiye, "çawa zaye wisa kirina bin erdê" ye. Ev yek bi ser nexist. Ez bawer im li hember vê yekê gelekî hêrsdar bû û xwest xirab bike. Gelek kes xistin rewşa xwekuştinê, revê û tevlîheviyê. Lê em jî mezin hînbûn û me mezin bandor kir. Bi şêweyê veguherîna asta netewî me rengê bandora wê da û ez bawer im KT jî vê yekê fêm dike û ew jî fêm dike.

Rizgarbûna min a ji wê, zayîneke duyem e. Hîna jî bawer nakim, gelo ma ez ji wê kabûsê rizgarbûm an nebûm? Em li dij neheqiyê, li dij zordariya mezin şer dikin. Di vî zilamî de dil gelekî mezin e, hezkirina welat misoger mezin e. Bêguman, ger xwe rewşa şervanekî kor. Û ya herî girîng jî aliyê pêşvexistina mirov a şer heye. Li gor min kesê şer neke ne dibe xwedî hest ne jî dibe xwedî hezkirin. Ger bibe jî gemarî ye. Ez hîna jî ji tu tiştekî ku baş tekoşînê neke hez nakim. Asta ku gav bi gav hezkirina min bi pêş ketiye, bi zanebûn, rêxistin, û asta pêşveçûyîna çalakiya kes ve girêdayiye. Ast misoger wisa ye, gav bi gav, bi pêşveçûyîna tekoşînê re tê. Derveyî vê yekê her tişt pûç e. Bila wisa fizîkeke we ya lihevhatî hebe, min ên wisa jî dîtin misoger nefret dikim. Mixabin dewlet, di vê mijarê de jî bûn qurbanê hesabên damezrînerên xwe. Ew wisa dihizirin ku ger jineke wisa lihevhatî bi kar bînin dê min bi dest bixin. Lewra berovajiyê vê yekê ez xwediyê wê pisporiyê me ku him dewletê û him jî wan bi kar tînim. Bêguman niha nikarin diyar bikin. "Apo çawa mirovan bi kar tîne?" bêguman ez ê bi kar bînim! Him jin

■ Şahmaran

bisepîne. Bûrjuva û kemalîstên herî jîr jî evqas zû û rayeyî fêm nekirin. Jixwe hostetiya vê ya mezin jî di vê derê de ye. Ev rewş tespît kir û mal ji Qereqoçanê da barkirin. Di 1975'an de hîna rêkûpêk derkete beramberî min. Dixwast vê yekê bibêje, jixwe piştre hindekan gotibûn, "Fatma li ser Kurdistanê dilêyîze, ez li ser Botanê dilêyîzim û nizanim kî li ser kû derê dilêyîze." Vaye nîqaşên wisa bi rê ve dibirin, bêyî ku tu kedê birijînin! Bi lêyîstina li ser min ve dixwast ji desthilatdariya berê ya malbatê desthilatdariyeke mezintir bidomîne.

Ev hetanî asta dawî bi şeytanî karanîna hiş e. Lewra dikarîbû bi teşeyê watedayînê jî şîrovebikira. Tirsnak temaşe dike, dibêje, "tu cîhana me reş dikî."

Min pir vekirî raber kir.

Ez cîhaneke azadiyê xêz dikim.

Di vê cîhana azadiyan de tu jî dikarî bibî xwedî cih. Hetanî dawiyê em ê piştgir bin. Jixwe têkiliya taybet jî ji ber vê sedemê ez hizirîm. Weke "ev gelekî hevkar e û dibe ku zehmetiyan bikşîne, bila ji niha ve xwedî piştgirî be", ez wisa remzî nêzîkbûm. Lê qutkirina têkiliyên xwe yên kemalîst û çîna hevkar li aliyekî bihêlin, xwe bi rengdayîna zemîna me ya çînî ve bi kar bîne.

Ez bawer im hebûna nakokiyeke mezin ferx dike. Ez bawer im me jî weke milîtanekî nû, dilpakekî gundî dihizire

Vaye hindek waneyên ku hun ji şêwaza me derbixin hene. Tu wisa li Kurdistanê, li mala xwe yan jî di odeya xwe de bi hêsanî nikarî birazî. Dê çavên te her li xeteriyê bin, dê destên te her li ser tetikê bin. Ji ber ku hema wisa bi hêsanî jî tu nikarî li mar bidî û bikujî. Li welatê me bi mîlyonan mar hene. Divê mirov sebirdar be.

Yek jî gelekan xwe li kavilê berxan pêçaye. Tu bi çekê nikarî lê bidî. Ez wisa serkeftineke bi lêdana çekê bawer nakim. Pir eşkere ye ku mar bi şêwaza klasîk nayên lêdan. Li şêwaza lêdanê binêrin. Me got, "maro tu bireve! Em ê li te nedin!" û wisa dika lêdanê cudatir û dema wê jî cewaztir bi pêş xist. Mesele di şexsê marekî de lêdana li hemû maran e. Di rastiya Kurdan de dema yek li yekî bide, dibêje "me tola xwe hilgirt." Di şerekî malbatî de, di şerekî gundî de her tim wisa dibêjin. Vaye şêwaza lêdana me wisa ye. Ger min jî di heman demê de lê daba ma dê wisa nebe?

Ger min bi şêwaza lêdana şerê Kurdan lê daba, min dê xwe biqedandiba. Vaye hişmendiya mezin di vê derê de ye. Vegezandina marekî, dayîna revandin û ya herî girîng jî xwe bi wî/ê nedayîna gezkirin gelekî girîng e. Niha hindekî Kurdistan ji maran paqij dibe.

Paqijbûna ji maran jî ji ber vê şêwazê ye.

Mar jixwe bi çil cureyan in. Yani di hest û hizir de jî mar hene. Hest û hizrên we yên mirinkar û xwedî jehra mar hene. Min ew eşkere kirin ne wisa?

Bihizirin hestek çawa we dikuje? Têkiliyeke erzan a jinê, têkiliyeke erzan a zilam, rayeke erzan, gafleteke erzan, rewşeke xewê, nemeşîneke rast a riyekê. Ev hemû mar in. Ev hemû ji şêwaza we ya xewok a kevneşop, ji neşiyariya li hember rastiya Kurdistanê, ji her teşeyê bandora dijmin re girtina çavên xwe, li her hawirdora xeternak ji meşa çavreşiyê û ji şerkirina we çavkaniya xwe digre. Ev yek jî qedîn e.

Ma hun dê çima rastiyan fêm nekin?

Ger hun xwedî hêza xeyalan bin hun dê van waneyan hîn bibin.

Ev welat wisa ye û li vî welatî şer wisa hate dayîn.

Digot ez şahbanû me, heta weke şahbanuyeke ku ez afirandime xwe bi rê ve dibir. Ji vê wêdetir, pir şanaz dilêyîst.

Ev şahmaraneke.

Pir balkêş e, bi her tiştê xwe bandor dike. Di deh tiliyên wê de deh şarezayî hene. Ciwanmêrên weke we di deqeyê de dibe. Keç jixwe li ser tiliya xwe didan lêyîstin. Şerê me bi rastî jî gelekî balkêş e û min jî ji karên wisa zewq digirt? Nizanim. Li gor we min çawa ber xwe da?

Cîhaneke wê ya desthilatdariyê hebû. Kesayeteke xwedî fêmkariya vê yekê ya lez e. Dîha di nîvên salên 1970î de didît ku ez derbeyeke mirinî li jiyana wan di asta herî jorîn didim. Ez li tu kesekî din rast nehatim ku xwe weke şoreşgeran raber bike, xeteriya herî mezin fêmbike û li gor wê xwe

dê ev hest we bibin ku derê? Ma ev li gor realîteya Kurdistanê rasteqîn in? Ev hest misoger we ber bi xewokiyê û derveyî nakokiyan dibin. Ber bi dahurînê û dîtina dijmin ve nabe.

Lê hawîrdor û kevala ku min afirandiye gelekî balkêş e. Bi qandî ku hêza min bes dike ez dikim. Hêza min encax têra vî qasî dike. Jixwe ger min ev serkeftin bi dest nexistiba, ma min dikarî ez marên di nava PKK de bibînim? Ma min dikarî provakator û koremarên nava PKK bibînim? Ger min hêza berxwedanê bi destnexistiba, di nav cîhana xwe ya hundirîn de, di nava PKK de, ma ez nediketim rast an jî çepê? Di tekoşîna rizgariya neteweyî de ma min dikarî ez vê hêza berxwedayînê raber bikim?

Dê hemû bibana. Vaye binêrin, ez waneya xwe çawa hîn dibim, ez mamosteyê têkîliya xwe çawa derdixim holê. Di wisabûyîna rewşan de misoger tu qest nîne. Çawa ku, ez di serhildana xwe ya yekem de bi birayê xwe re rû bi rû mam, qaşo dê ev jî ji min re biba hevjîn. Lê rexmî vê yekê bûyerek çêbû. Ji dirûstiya min a vê derê tu caran guman nayên xwarin.

Di encam de damezrîn an jî plan nîne. Rewşeke girêdayî rast bi destgirtina şêwaza mirov bi xwe ye, girêdayî tawîz nedayîna ji rêgeza azadiyê ye. Hema weke serhildana yekem, li hember rêgeza feodal şerekî azadiyê hate dayîn. Li vê derê jî li dij mêtîngerî, hevkarî û heta li dij têkiliya jinê ya ketînêr bi wergiriyeke mezin şerekî azadiyê hatiye dayîn. Ya girîng jî, em ê ew cîhana we ya ji cîhana Kurd pêk tê vebikin.

Ez her roj li ser fermanan kûr dibim. Ez dibêjim, hesas be! bi berbirsyarî tevbigere! Ma mirov wisa dikeve kemînê? Ma mirov wisa pêle mayînê dike? Tu caran ev tişt nakevin serê min. Ez ê dîn bibim. Niha ev kesayet li paşila diyan de bi nazdarî hatine mezinkirin. Cîhaneke wan a têkîliyan heye, bi navê "dost" xwe lê pêçane, xwe wendakirine, neqebûlkirineke wan heye. Ma şergeriya Kurdan jî wisa nîne? Di heman demê de xwewendakirina di wî şerî de. Her du jî bêencam in.

Lewra ya min dikeke pir balkêş e. Hun arenayê dizanin. Şerêkî diavêjin arênayê, yek jî gladyatorekî weke Spartakûs. Yekî weke Spartakûs derdikeve bi şêr re şer dike. Ya me naşibe şeran. Marekî mezin, jixwe giyana mirov dicemidîne.

Erê, marekî cemidînêr. Zimanê xwe derxistiye, dixwaze jehra xwe ya weke qeşayê birêje. Jixwe wisa kir. Erê wisa bihizirin ku hun deh salan bi wê re di heman cihî de man.

Niha Kurdistan bi maran ve dagirtiye. Em li ser qehremanên xwe yên ku dixwazin bi maran re şer bikin bihizirin. Di heman kêlikê de dê werin lêdan û biçin. Yanî axa, beg û hevkar hemû mar in. Jixwe dorhêl bi ajanan ve hatiye dagirtin. Hemû cerdevan mar in.

Hun dê çawa ji destên van xilas bibin?

dide mirov. Hîna tê bîra min, qey hemû giranî bibûn yek û li hemberî min raweştîbûn, hemû pirsgirêk têkilhev bibûn li gel hevbûn. Qey weke ku ez wê careser nekim nikarim tu gavekê biavêjim, asteng û lûtkeyeke mezin li pêşberî min raweştiyaye. Ger tu nikaribî çareser bikî tu nikarî bi pêş ve biçî. Ger tu têneperî meşa te nagihe encamê. Ka dibêjin, jiyanê tevna xwe hunaye û dê te bixîne nav. Tu yê têperî yan jî têneperî? Û her ku diçû ez difetisîm, divê qey ez di nîva golekê de me û vedigevizim. Ma ez ê bigihêm qeraxê yan jî negihêm, ez di nava van hestan de me.

Di wê derê de dîrokek veşartiye.

Mêtîngeriyek, xiyaneteke Kurdan, ketineke Kurdan, xiyaneteke jinê, xirab bikaranîneke jinê.

Şêwazeke min a kuştina maran hebû. Her ku çû ev şêwaza min li gund hate bihîstin û kê mar dîtiba direviya dihat gel min. Bi vî awayî min pêşengtiya kuştina maran bi dest xistibû. Dîsa di paleyê de ez xwedî îdia bûm. Ez her kesayetekî wisa xwedî aso bûm. Dema em di rêkê de dimeşiyan diviya ku misoger ez gavekê bi pêş ve bûma û ya girîng jî dema ku min ev yek dikir ez xwedî baweriya hêza xwe ya puxteyî bûm. Tu deman bi spartina tu kesekî din ve ez nebûm xwedî derfeta pêşveçûnê. Tu daxwaziya min a wisa jî tune bû.

Em hemû tevgerên fetihgerekî ne

Ez li dûv çivîkan direviyam. Li banî girtina çivîkekî, bi qandî îmhakirina yekîneyeke dijmin girîng e.

Hilperîna bi hêlînên teyran ve, dîsa kuştina çend maran, tiştekî weke kuştina dijmin e.

Ez bi qandî ku gelekî xwezayî bûm ewqas jî bandorkar bûm.

Wisa bi hezaran bûyerên min hene.

Gelo pêwendiyên we yên wisa çiqas in?

Pêwîst e mirov bi we ezmûneyekê bide jiyîn. Em direndeyekê yan jî marekî biavêjin rastê. Ka ev dê rê li ber hest, hizir, formasyon û teşegirtineke çawa vebike? Mirov weke gurekî serîhildayî bihizire, weke marekî bihizire, weke direndeyeke ji rêzê bihizire, dê çavên we derbixe, dilê we derbixe û dê hawireke wisa we gelekî tengav bike, wê demê mirov dikare taybetmendiyeke çawa bi dest bixe? Em rêxistineke mezin û hêzeke parastinê bidin we, ma hun dikarin wê bi kar bînin? Ma hun dikarin ji baldarbûnan birevin? Ma dê çavên we her dem amade nebin?

Ma ev yek ne taybetmendiya herî bingeh a şer û şervanan e?

Kurdistan bi maran ve dagirtiye.

Di bin her kevirî de marek heye ne wisa? Balkêşiya min esas zeka min e. Ez dibêjim ger welatê te çawa ye, divê hundirê mala te jî wisa be. Serhildana me ya yekem jî kêm zêde dişibe vê yekê. Hun çawa têkîliya jin-zilam dijîn ez ji we re bibêjim. Hun weke zarokê di paşila diya xwe de razayî ne. Di nava malê de jî hun ewladên gelekî baş in. Ger têkîliyeke jin-zilam jî hebe,

Şahmaran



**Ez zagonekê li ser we bar dikim.
Zagona rast hezkirinê.
Zagona gihiştina azadiyê.**

Abdullah Ocelan

Analîzên Hizrî

Fatma di cihekî de dibe kurtasiya dîrok, civak, mêtînger û hevkarên desthilatdariyê. Bêşensî yan jî şensê min, wisa balkêş û dixwaze lêrasthatî be, dixwaze weke encameke xwezayî ya vaca tekoşînê be, dixwaze jî bila îfadeya kesayeta ku ez pê re rû bi rû mame, têkîliya bi jinêke wisa re hêz

*Ramanwer û rêberê siyasî, di sala 1949an de li Orfayê - Bakurê Kurdistanê ji dayik bûye, li zanîngeha Enqerê beşa zanistên siyasî wergirtiye, Damezrîner û rêberê Tevgera Azadiya Kurdistanê ji dawiya salên heftêyî yên sedsala borî de, ji sala 1999ê ve li Tirkiyê di zindanê de ye. xwediyê felsefeya "neteweya demokratîk" e ku di pirtûka xwe ya bi navê "Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk" de li pênc beşên wê weşandiye.

Tevî damezrandina Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî "Unesco", ku yek ji erkên wê ew e ku her sal lîsteya kelepûrên çandî yên cîhanê ragihîne û berfireh bike, lê ev têr nake, ji ber ku ew erkê destnîşankirina lîsteyên kelepûra çandî ya cîhanî bi welat û hikûmetên navneteweyî yên xwedî dewlet sînordar e, lewma gelek gelên ku xwediyê kelepûreke çandî ya dewlemend in û negihîştine mafên xwe yên rewa mîna welatên din ji derveyî van lîsteyan dimînin, bi vî awayî beşeke mezin ji kelepûra çandî ji ber polîtîkayên cîhanî yên nerast di bin xetereya windakirin û tunebûnê de ye.

Li aliyekî din hewlên hin hikûmetên dagîrker ji bo wêrankirin û talankirina çand û kelepûra çandî ya gel û civakên ku bi zorê wan bi rê ve dibin. Li vir hejayî bibîrxistinê ye ku çanda gelê kurd ku gelekî kevnar e di li ser xaka Mezopotamyayê, rastî gelek siyasetên bişaftinê û qirkirinê hat û hîna jî tê, mîna qedexekirina zimanê kurdî ji aliyê dewletên ku Kurdistan dagir kirine, û hemû rêbazan dimeşînin da ku çand, ziman û kelepûra vî gelî bidin windakirin.

Di heman demê de tundrewiya etnîkî di şerê li dijî çand û kelepûra gelan de xwedî rol e, tundrewiya olî jî heman rola xerab dilîze. Hemû cîhan şahidê kiryarên rêxistina terorîst a DAIŞê bû, ku gelek şûnwar û muzexane li Iraq û Sûriyeyê wêran û talan kirin, di nav de Muzexaneya Reqayê li bakur û rojhilatê Sûriyeyê, her wiha hewldana wê ya ji bo bidawîkirina çanda Êzidiyan li devera Şingalê li bakurê rojavayê Iraqê. Ji ber vê yekê pêwîst e sîstemên demokratîk ên "ji etnîsîte, gel û olan re vekirî ne" ji bo parastina kelepûra çandî ya gelan rola xwe bilîzin.

Ji ber giringiya "kelepûra çandî" û rola wê di avakirin û hevgirtina netewe, gel û civakan de, her wiha di afirandin û ronîkirina cihêrengiya çandî û şaristaniya mirovî de, desteya sernivîskar a kovarê girîng dît ku bibe mijara dosyaya hejmara sêzdemîn. Her wisa di hejmarê de gelek mijar û nivîsên wêjeyî yên hêja hene, bi hêviya ku xwînerên delal sûdeke baş jê werbigrin.

Kelepûra çandî bingeha nasnameya gelan pêk tîne û her gel û civak bi kelepûra xwe tê nasîn, hemû civak jî kelepûr û mîrasa xwe ya çandî diparêzin û li gor nûjeniyê, hewcedarî û ruhê serdemê şêwazeke nû ya jiyanê pêşkêş dikin. Ew jî dibe ku bi awayekî xwezayî be yan jî hatibe ferzkirin.

Kelepûra çandî ya şênber parçe û berhemên arkeolojîk (resim, xêzkirin, çap, mozayîk, peyker û... hwd.) û avahiyên dîrokî û olî, şûnwarên arkeolojîk û hemû şûnwarên mirovî yên wekî wêne, belge, pirtûk, destnivîs û amûran, hem yên takakesî û hem jî yên komînal, digre nava xwe. Lê belê kelepûra çandî ya razber her tiştê ku bi aliyên rewanî, giyanî û afirînerî yên kirdar û rêûresmên civakî ve girêdayî ye (cejn, rêresmên zewacê, rêûresmên olî û ayînî û...hwd), cil û bergên gelêrî, zimanê dayikê û wêjeya gelêrî ya devokî (efsane, çîrok, jînenîgarî, helbest û stran), gotinên pêşiyan, têderxistinok û... hwd.), hunerên gelêrî (stran, dîlan, festîval û... hwd.), lîstikên gelêrî, şêwazên jiyanê û jêhatîbûnên ku ji bav û kalan hatine wergirtin û...hwd.

Gelên Rojhilata Navîn jî weke gelên din ên cîhanê bi kelepûra xwe ya çandî û şaristanî dewlemend in. kelepûra Ereban ji aliyê helbestê ve (heta dihate gotin ku helbest Dîwana Ereban e) û hem jî di çîrok û jînenîgariya leheng û kesayetiyan de dewlemend e (Jînenîgariya Pêxember, Entara, Seyf Bin Zî Yazan... hwd). kelepûra Kurdî bi stran, çîrokên gelêrî, destanên evînî û qehremaniyê (Mem û Zîn, Ferhad û Şîrîn, Zembîl Firoş, Xecê û Siyamend, Rustemê Zal, Kela Dimdimê..) û Cejna Sersala Kurdî (Newroz) û rêûresmên wê, ji bilî çanda kurdên êzdî, li ser cejn, şahî û baweriyên olî, bandoreke taybet jî dikin. Çanda Suryaniyan di stranên gelêrî û şahiyên olî de jî dewlemend e, û Cejna Akîtu (Roja Sersalê ya Suryanî Asûrî û Kildaniyan) ku yek ji kevintirîn cejnên cîhanê ye. Her wisa kelepûreke taybet a gelên Berber, Ermenî, Quptî, Çerkez, Turkmen û...hwd, heye. kelepûra çandî û şaristanî ya gelan û neteweyan bi hemû şêweyên xwe ji bo zarok û nifşên niha, pêwîst e bê parastin û berçavgirtin, ji ber ku erkê parastina wê erkekî mirovî ye, hem ji kesan û hem jî ji rêveberiyên welatan tê xwestin.

Pêşekî

Kelepûra çandî... û pêwîstiya parastina wê

Desteya sernivîskariyê

Hemû gel, netewe û civakên li ser rûyê dunyayê xwedî raberdû ne, her civak û gel xwedî nasname, çand, şêwaz û rêbazeke taybet a jiyankirinê ye, lewma her civakek jî xwedî mîrateyên şênber û razber in ku ji nifşekî derbasî nifşekî dibin. Ji ber ku meşa şaristaniya mirovatiyê encama kombûn û kelepûrên şênber û razber ên hemû gel û neteweyan e, ji destpêka mirovahiyê ve kelepûr an jî mîrata çandî di pêvajoya jiyana mirovan de xwedî rol e.

• **Jin û çand** .....
- Jin û Mîrateya Çandê.. (Nêrgiz Ismayîl)..... 55

• **Çîrok** .....
- Veger.. (Selam Hisên) 58
- Axxx…War.. (Abbas Abbas) 61
- Sêşem.. (Mihemed Welîd) 63

• **Helbest** .....
- Jiyana Biharkuj.. (Cemîl Xoce) 66
- Ji Te Bûm.. (Siyabend Siyarojê) 67
- Şadiya Dil.. (Diyar Hemî) 69

• **Serbest** .....
- Mîtolojiya kulîlka Beybûn û Berfînê.. (Jiyan Bozo)..... 71
- Sê Gundên Til Temirê (Boxaz- Asî – Şûniyê).. (Şerîf Mihemed)..... 74

Naveroka Beşa Kurdî

• **Pêşekî** .....
• Kelepûra çandî... û pêwîstiya parastina wê.. (Desteya Sernivîskarîyê) 5

• **Analîzên hizrî** .....
• Şahmaran.. (Abdullah Ocelan) 8

• **Dosyaya Hejmarê** .....
• Wêjeya Devkî Di Çarçoveya Teyorî û Rêbazên Lêkolînê Yên Nûjen De.. (Gulîstan Sîdo)..... 21
• Kelepûra Kurdî û Parastina wê..(Elî Roj)..... 27

• **Lêkolîn** .....
• Ehmedê Xanî û Wêje... (Diyar Bohtî) 32

• **Hevpeyvîna Hejmarê** .....
• Li Gel Nivîskar Zeynelabidin Zinar e (Aram Hesen) 39

• **Pirtûkên Derketî** .....
• Romana Kafkayê Rojhilat ”KUNDÊ KOR”a Sadiq Hîdayet.. (Lokman Polat) 45
• Pirtûkên Derketî.. (Desteya Sernivîskarîyê) 50

Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî , herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

ŞERMOLA
شـــرمولا

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane û Serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê weşandin.
-Di 24 Êlûna 2018›an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019›an de derket.
-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019›an Hatiye Dayîn, girtîye.

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.
-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.
-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.
-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.
-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:
Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.
-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên gîştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê gîştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:
Aram Hesen

Desteya sernivîskarîyê:
Aram Hesen
Abdullah Şikakî
Ehmed Alyûsiv

-Malpera kovarê:
www.shermola.net
-E-MAIL:
shermola2018@gmail.com
-Telefon û whatsapp:
0994712053

-Kovar li Çapxaneya Şehîd Herekol – Dêrik tê çapkirin.
-Belavkirin û Firotin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşgeha Alşemal – Qamişlo 0998234958.
-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.
- Nirxê kovarê (1500 L.S).

Tabloya Hunermendê Şêwekar Welîd Murad

ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye Hejmar: 13 Zivistana 2022 z

Dosyaya Hejmarê
Kelepûra Çandî

Hevpeyvîna Hejmarê Li Gel Nivîskar Zeynelabidin Zinar e

Ehmedê Xanî û Wêje

Jin û Mîrateya Çandê

■ Tabloya Hunermenda Şêwekar Biharin Sino